

BERBANG



TÊXISTINÎ

Du salên jiyane di bin nirê diktatoriyê de.....3
Murad Yilmaz

Zıman.....5
Osman Sebri

Dengdan.....7
Kurdi: E. Zêrin

Çirok û Kurte-çirok.....12
Cigerxwîn

Mirişk û Xwedê.....12
Mahmut Baksi

Hevpeyvînek bi M. Emin Bozarslan re..... 13
Şoreş Zirek

Rabin Şehidno.....20
Firat Ceweri

J1 Hemû hêzên demokrat re.....21

Xaçerêz..... 22

Agri..... 22
Osman Sebri

Karikatur..... 23
Mamoste

Va ye em bi Berbanga sîsîyan disa bi we re ne. Hejmara duwem bi derîngi gihişt we. Sedemên vê derengiyê ev bûn: Di dû weşandina hejmara yekem re, em rind têgihîştin ku bi pars kirina daktîlo û ale-tên w.d. weşandina kovareke wek Berbangê ne hesa ye. Lew re digel xîzaniya xwe ya dravi, me biryar da, ku bi kîrîna an rîyên din, van tîştan peyda bikin. Berî peyda kirina van ji me nîkarîbû kovarê biweşînin.

Me hejmara sîsîyan ji gelek bi lez weşand. J1 ber ku me xwest em wê bigihînin roja salvegera dusalîya cûnta faşîst—12.Îlon.1980— J1 niha pê ve bê tîfaq û teşqele û bi canê sax, em ê Berbangê her serê mehê bigihînin we.

Derheq zmanê Berbangê, bi gotin an nivisandînan gelek gazin û lome tîn kîrîna. Me, di hejmarên buhurî de ji nivisandîbû; Berbang j1 bo çareser kirina problemên zmanê kurdi û awayên nivisandina wê, xwe wek otoritekê nabîne. Ev problem, ew çend gran û pîralin e, ku bi têkil bûna kovarekê an çend kesan tu car nayên bîşaftin. Bo vê xebateke fîreh û dûr û drêj dvêt. Berbang di vê rîyê de, li gor karîna xwe dikare çend gavan bavêje. Belam, di rewşeke wulo de ku her nivîskarekî Kurd, zmanekî û imlakê xwe ya taybetî heye, em nîkarîna tu kesî mecbûr bikin ku bi awayê me binivîsîne.

Lew re, dema ku me nivîskarên Kurd vexwend ku di Berbangê de binivîsin, me sozêki da wan. Li gor vî sozî, Berbang dê nivîsarên wan bê guherandîna çap bike. Berbang li ser sozê xwe ye. Lê bi hêviya ku em bikarîbîn rê li tevlihevi û bê serûberîyeke gelek mezîna bigrin, me j1 gelek nivîskarên destûra wan xwestîye, ku em bikarîbîn nivîsarên wan bi imla Berbangê çap bikin. Di vê hejmarê de, nivîsarên Osman Sebri, Cigerxwîn û Mahmûd Baksi, bê guherandîna (bê ku em bi tu awayî têkilî nivîsarên wan bibîn) hatîna çap kirîna. Rastî û şasi—ger hebîna—yên wan in. Berpîrsîyarê nivîsarên mayî Berbang e.

Serêşeke me ya mezîna j1, kula her car, rewşa dravi ye. Hun dizanîna çend abonên Berbangê hene? Sisê. Belê belê, hun çewt nabin, sê kes in abonên Berbangê.. Di sê hejmaran de sê abone.. Me j1 her hejmarekê re abonekê peyda kirîye. Em ne jêhati ne?

Hinek kes wulo dizanîna ku em j1 dewletê alîkarîyeke gelek mezîna digrin. Tewer (hetta) dibêjin hun nîkarîna çend kesan bi maaş bîdîna xebitandîna? Lê mîxabîna, dewlet serê her hejmarê 2000 (du hezar) kron alîkarî dike. Û malîyeta her hejmarekê j1, nêzîkî 10.000 (deh hezar) kron e.

Alîkarîya kovareke çandî û xwerû bi zmanê kurdi, wezîfa her we-latparezekî Kurd e. Heta niha, me j1 hemû Kurdên ku li Swêdê dijîna re—yên ku navnişanên wan li cem hene— her hejmarên Berbangê belaş şandîye. Em ê j1 niha pê ve j1 bişînin. Heta ku perên me tîrîna. Em bawer in, em bi vî awayî wezîfa xwe bi cih tinîna. Em hevidar in, hun ê j1 wezîfa xwe bi cih binîna. Heta hejmara çaran bi xatîrê we.

BERBANG

SAL 1
HEJMAR 3

BERBANG

İLON—1982

BERBANG
Kovara Kurdi, Xwedi:
Federasyona Komelen
Kurdîstane Li Swede.
Biha:5:- Abona Saleke
50 Skr / 25 DM.

BERBANG- Kurdisk Tid-
skrift. Ansvarig Utgivare:
Kurdiska Riksförbundet.
Pris:5:- Prenum:Enskilda
50 :- / år, Organisationer
100 :- / år

NAVNISAN-ADRESS:
Sveavägen. 135 N.B.
113 50 STOCKHOLM
Tel: 08- 33 07 09
Postgirot:643880-8
Stockholm/Sweden

TIRKIYE

Du Salen Jiyanê Dı Bın Nirê Diktatoriyê De

MURAD YILMAZ

Bı 12ê İlona 1982 ya du salên jiyana gelê Kurd û Tirk a dı bın nirê diktatoriya faşist a leşkeri de dıqedın, a sı-sıya destpêdike. Du sal berê , dı 12 ê İlona 1980 yi de fermanarên hêzên ordiya Tirk, anarşi, teror û bê çare-tiya parlamentoyê ji xwe re sedem dan nişandan û bı darê zorê dest dan ser kırdayetiye (iktidarê). Makzagona ku wan bı xwe ji meşrûiyeta fermanariya xwe jê distend, ji holê rakırın, parlamento, partiyên sıyasi yê n resmi, sendikên krêkaran û hemû komelên demokratik ên cıvaki dan girtın. Lı çar alyên Tirkıyê, lı tevayıya gund û bajarın polisên hêzên ewlekari û leşkerên ordiya Tirk êriş bın ser gel, bı deh he-

zaran kesên pêşverû, demokrat û welatparêz cıvandın, dagirtın girtigehan. Mafên mirovayı, azadiyên bı tekoşına solan ve hatibûn bı dest xıstın, tev bı carekê de ketın bın piyên generalan. Nizamek hov û har ku kes bı fermanên generalan bimeşe, dameziri. U eve du salın, ku vê nizama han her ku diçe dijwartır û hovtır dibe.

Van her du salên bori, baş dan nişandan, ku sedemê hatına generalên faşista ser kırdayetiye ne ku wek wan goti anarşi û teror bû. Erê, raste beri 12 ê İlona sala 1980 yi terorek geş hebû. Lı Tirkıyê bı kêmasi rojê bist kes dihatın kuştın. Edi eşkere dest bı qetliaman hatibû kırın. Lê hê baş dı bira me de ye, ku ev kuştın, teror

û qetliam, ne ku ji derveyi firsenda dewleta Tirkıyê dihatın kırın. Bı alikariya dewletê, ji bal hêzen faşist ên Tirk dihatê birêve xıstın. Lı pişt tevgera faşistên Tirk, dı hundirê welat de bircıwaziye monopol ê Tirk û dı çada navnetewi de ji rêxistinên kevnepereşt ên emperyalist û bı taybeti Emperyalizma Emerika Yekbûyi he-



bû. Hêzên faşist xwe dî nav polis, ordiyê û mîxaberatê de bî cih kiribûn û bî alikariya wan êrişên xwe dibîrîm ser kirêkar, gundi û hêzên şoreşger ên Kurd û Tirk. A kaniya anarşi û terora beri 12ê Ilonê dihat meşandin, ev bî xwe bû. Lew re ji ev bûyer tu cari nebû sedemê hatina cunte leşkeri ya faşist.

Bî tevayî, mirov dikare bêje, ku du sedemên esasi yê hatina cuntayê hebûn: Yek jê bonana abîni, civaki û siyasi bû, ku Tirkîye ketibû nav. Jî ber nizama sermîyandari û grêbendîya Tirkîyê bî emperyalizmê ve, dî wan çend salên dawî yê berî darbê de, rewşa abori ya Tirkîyê gelek dijwaz bûbû. Xwinmêjiya emperyalizmê, barê grêbendîya bî yê ve û xîrsa burjuvaziyê monopolê Tirkîyê a karkirîne, dî jina abori ya welêt de birinê nê xêdar vekiribûn. Monopolên gregirên Tirkîyê û rexistinê mali yê navnetewî, siyaseta abori ya kirdayetiyan lî gor mafên xwe dadigerandin. Vê yekê jî jî aliki de van hêzan dewlementir dikir, lê jî aliyê din de jî çin û tebeqên civakê yê lî derveyî monopolan dixist bin barên hê girantir. Deynê Tirkîyê jî 20 milyar dolari pirtir bûbû. Dî civakê de jî 6 milyoni zêdetir kesên bêkar pêkhatibûn. Inflasyon, jî ber jî qîmetxistina perê Tirkîyê lî hember perên dewletê nîyanî û jî ber buhabûnê her ku diçû zêdetir dibû. Feqîrî, birçîbûnî û sefalet dî nav gel de fireh dibû. Jî ber siyaseta aboriya monopolan, kebqên xwedî mal û sermîyan yê lî derwayî monopolên gregir dî ber xwe nedîdan her ku diçû ber bî malwêranyê de diçûn. Jî ber vê jî, him mîxalefeta çîna kirêkar û kêşên Tirk û tevgera gelê Kurd a milî û demokrat fireh bûbû, him jî reqabet û dijîtiya nav burcuwazi bî xwe gijtir bûbû. Vê dijîtiya çîni, tebeqî û milî û reqabeta dî nav burcuwazi, dî jiyana civakê de lî her wari xwe nişan dîda. Lî kargehan, dî warên xebatê yê din dî mangirtin (grev) geş dibû, têkoşîna siyasi ya şoreşgerî xur-

tir dibû, şerê dî nabêna hêzên pêşverû û hêzên kevneperest û faşistan tûjtir û gijtir dibû. Burcuwazi xwe bî xwe jî dî peywendiyên abori û dî warê siyasi de lî hev nedikir û nikaribû reqabeta nav xwe veşêre. Lî alî partiyên burcuwazi, tabloya siyasi ya ku pêkhatibû, nikaribû jî parlamentoyê kirdayetiyeke imîr dirêj û xurt derxe kirdayetiyeke hevkar (koalîsyon) ên ku bî dek û dalabên nav parlamentoyê pêk dihatin jî nikaribûn lî gor dilê monopolan bimeşin, wek ku ew bêjin çî karîbîna pêkbinîna. Her çiqas parlamentoya burcuwazi, dî kar û barê lî hember gel de dibû yek û qanun û biryarên lî hember gel, ên dij demokratîk derdixist jî gava dor dihatê ser qanun û biryarên lî ser têkiliyên abori û siyasi yê nava burcuwazi, siyasiyên nîminenteyên monopolan kîkarîbûn her tiştî lî gor dilê xwe pêkbinîna.

Her çiqas dî çend salên berî 12ê Ilonê de, gelek maf û azadiyên dî çarçewa demokrasiya burcuwazi de hatibûn qutkirin û her çiqas kirdayetiya siyasi bî êrişên zordest ên hêzên ewlekari û bî avakirîna dageriya leşkerî lîdara orfî dî gelek bajarî de, hatibû destekirin û demokrasiya burcuwazi bî vê rewşa xwe gîhaştibû hîdûde imrê xwe yê dawî jî, vê yekê nikaribû xwe bîkîra warê jiyana kirdayetiya monopolan. U monopo gîhaştibûn qenaetek wîlo, ku divê demokrasiya mayî jî vemalîna bavêjin, û diktatorîyeke wîlo deynîna ku çî mîxalefeta hebe bîpelçiqîne, bînerd bîke. A sedemek dest dana ordiya Tirk a ser kirdayetiyeke ev bû. Loma jî dî 12ê Ilona 1980'yî de monopolên gregir bî darba generalên faşist hîşk dor lî serê kaniyê girtin û destpêkirin gav bî gav ava lî ser hêzên civakî yê nava derwayî xwe mîçiqandin.

Mirov dikare bêje, ku pêvajoya kar û barê cuntayê yê dî van her du salan de, dî du qonaxan derbasbûye. Qonaxa yekem bî hatina generalan a ser kirdayetiyeke destpêkirî û gelek kurt ajot.

Divê qonaxê de burcuwazi belakirîna qeyd û bendên mayî yê nava demokrasîyê (her wekî laxwîkirîna makzagona 1961'î, belakirîna kirdayetiya sîvil û parlamentoyê, girtina partîyan û komelên civakî û h.w.d.) û bî birêvexistîna terora faşist a dewletê, rê lî bir siyaseta xwe ya abori û tekûzkirîna bandêriya xwe vekir. Dî vê qonaxê de jî jor ber bî jêr de terorek hov û bê serû û ber hat honandin. Otorîte û karbidestî dî destekî de hat civandin.

Pîştî vê, qonaxa duwemîna a, ku heta iro dajo destpêkir. Dî va qonaxê de karê jî bal cuntayê ve hatiye û tê kirin jî alî siyasi de ber bî armanca lî him runîştandîna dewleta faşist bî hemû dendam û diviyahiyeke wê de ye. Jî alî abori û civakî de jî armanca, tekûzkirîna bandêriya sermîyandariya malî, bî şîdkirîna serdestî û çavdêriya monopolên gregir lî ser jiyana abori û civakî, xurtkirîna abori de, ango xelaskirîna pêvajoya sermîyandariya dewleta monopolîst e.

Bî rastî, dî vê rîyê de gelek gawên mezîna hatîna avêtin jî. Eve du salîna, pergala dewletê û jiyana civakî lî gor qeyd û bendên jî ferman û biryarên generalan pêkhatî dimeşîna. Her çiqas konseyan generalan, dî bin emrê xwede kirdayetiyeke û meclîsek şêwrê damezrandîye jî tu fonksiyoneke van a lî derveyî iroda cuntaya generalên faşist nîna. Jî fermanên ew bîdîna divê weke biryar jî meclîsa şêwrê derê û bê lî hember rabûn, jî bol kirdayetiyeke bê bîcîh anîna. Jî bîlî burcuwazi û nîminenteyên wan ên nav çerxa burokrasiyê jî hemû hêz û kesîna re siyaseta hatîye qedexekirin. Divê lî dijî an lî derwayî bawerî û biryarên cuntayê tu tişt neyên gotin û neyên nîvîsin. Lomajî çî kovar, rojname û pirtûkên, pêşverû û demokrat hebûn, hemû hatîna qedexekirin, kesên birewer û bawermend ên hema piçeki jî mîxalîfî cuntayê bîna dî girtîgehan, dî bin hoyên dijwar de dijîna. Televîzyon, rad-

yo û hemû rojname û kovarên ku eşkere dertên hın bî dîl û can bûne dengê vuntayê hinan ji hustiyê xwe xwarkirine dî çerçewa izna cuntayê de jiyana xwe didominin.

Jî bilî rêxistin û neqebên burcuwaziyê mezın, hemî komele û neqebe hatine qedexe kirin. Kırêkar û kedkırên welat ên dın ji mafê rêxistinî û doz- parêziya xwe bê parın. Tevayiyê serek û karbidestên komele û neqebên pêşverû, iro yan gırti dî zindanan de ne yan jî jî ber êriş û terora cuntayê, dev jî welatê xwe berdane, derketine welatên bıyani. Kırêkar û xebatkarên mayin ne dıkarın jî bo aboriyek hê çêtir doza destmızek (ucret) baştir bıkın, ne jî gava mafên ku mayi tê xesp kırım, dıkarın lı vê mafê xwe herın. Mafê mangırtın û kar sıstkırınê jî halê rabıye. Hew mafeki xebatkarın maye. Ew jî rewş çı dıbe bıla bıve, jı bo kara burcuwazi, bê hêsabûn û rawestan karkırın e.

Jı ber sıyaseta cuntayê ya lı ser aboriyê, roj bı roj buhayê dıvıyahıyên pêwıst ên jıyanê bılıntır dıbe. Rewşa heyên jıyanê dı qonaxek wılo dıjwar dı ye, ku jarı, belengazi û bırcıbûnı dor lı cıvakê gırtıye. Xelak bê deng ketıye nav gel. Lı gor beyanên dewletê bı xwe jı, dı rew de jı bodebara malek bı pênc nufusan mehê 80 hezari zêdetır perê Tırkıyê dıvê. Lê iro lı Tırkıyê kê m kes hene ku hatına wani mehane jı 20 hezari Lireyi bıbuhure. Rewşa gundıyan û bı taybeti gundıyên feqır ên Kurdistanê xırabtıre. Iro lı gunda bı kes hene ne ku mehê, salê jı 20 hezar Lire hatına wan nıne. Jı ber malhebûna kesı (ku pıranıya erdan dı destê axayan deye) û jı ber bêkari, gundi tu cari bı zıkeki têr nan naxwın, jıyaneke wani bextewer nıne.

Hê beri darba leşkeri jı 6 mılyoni zêdetır kesên bêkar ên dı çaxa xebatê de hebûn. Pışti sıyaseta cuntayê ya van her du salan, bêkari geştır bû. Bı hezaran kesên şoreşger û welathez jı karên

Dûmahik li rûpel 19

Hevalên hêja,

Vexwendeka we hat, lê mixabin ku jîmara Berbangê a ku we derxistiye negiha destê min, heye ku bî carekê negihê min. Ev e rewşa min di vî welatî da! ma çî ji destê min derdikeve?

Ez xebata we ya derheqê ziman da pîroz dikim. Jî bo îro Kurdek nikare çêtirî xebata ziman jî bo gel û welatê xwe bike. Çıqas qenc û dî rê da ye ku hûn kalekî wek min jî bo vê xebatê vedîxwinin. Ez dê her û her jî bo xebateke holê amade û pêkhatî bim, bî şertê ku nivisanên me herdu serıyan bigehên hev. Na gava nivisanên me negihên hev, hûn bixebitin, ez de li bende roja xwe bım. Bawer im ku ew roj dê bê.

Gelek silav û xweşî jî bo we birayên ku jî bo ziman dixebitin. Serfirazî û serbılindî her jî bo kesên xebatkar e.

O. SEBRÎ

ZIMAN

O. SEBRÎ

Ziman ew tişt e ku mirovan jî dehban cuda dike, hildide warekî bilind û ronak. Mirovan her dem û gavê bi ziman kariye kam û daxwazên xwe bide xuyakirin û bi zanin û hişyarî bigehê armancên xwe. Gelên serwext û hişyar jî roja xwe nasîne digel zimanê xwe bendewar bûne û goreyî demên ku tê da, zimanê xwe pêş va birine û di wê rê da jî tu fedakariyan bi şûn da nemane. Herçî gelên ku wekî me Kurdan bi zimanê xwe ra bendewar nebûne, mane li dawıya koça jî nê û nikaribûne jî xwe ra di nav gelên cihanê da rûmet û giraniyekê çar bikin.

Ma gelo em dikarin ûştta bendewar nebûna Kurdan digel zimanê xwe, li vêder bi awakî durust bidin ber çavan? Bawer im ku ev yeka han dijwar e û jî me nayê. Lê çawan bêjeyên bıyanî di zimanê Kurdî da cih girtin û bêjeyên Kurdî jî ziman hatin bi dîrxistin, ev yek jî ber çavên kesî

nayê te veşartin. Ev yeka han bi destên beg û axan, şêx û melan çê bûye. Ango bi destê wan kesên ku bi navê Kurdan digel milletên serdestî wan ra didan û distandin çê bûye. Ev kesên han heke bixwazin xwe jî vî gunehê han bişon jî nikarin.

Zimanê Kurdî jî ber ku pê nivisan nebûye û dî dibistanan da nedane xwendin, jê çend zarava çar bûne, ku her zaravayek jî van bûye zimanekî xweser. Wek: Kurdmancî, Zazayî, Soranî, Fîlîan bextiyarî. Xelkê her yekî jî van zaravan tiştêkî jî zaravayên mayî nizane. Ji van her çar zaravan yê firehtir Kurdmancî ye ku nîzîkî nivê Kurdan pê dıpeyivin. Lê mixabin ku ev zarava negihaye warê xwendin û nivîsandinê. Çıqas ku jı heftê salı û vir da li Ermınya tete xwendin û nivısandın jı, bı tu awayı jı warê zımanê folklorı derbas nebıye. Ew

kesên ku hîmê ziman ji Kurdên Sovyatistanê ra danî bûn, hin ermeniyên ku li Kurdistanê mezin bûbûn, herwekî divya bû bi Kurdmancî nedizanin. Ji her çar zaravayên Kurdî tenê Soranî hinekî pêş ve çûye, lê ji bextê kambax ne zaravayê pîrriya Kurdan e.

Heke Kurd bixwazin di hemî warên jînê da xwe bigehînin gelên aza û pêşverû, berî her tiştî divê digel zimanê xwe bendewar bibin. Çawan mirovekî lal nikare kam û daxwaza xwe ji kesî ra bide nasîn, gelê ji zimanê xwe ra bigane maye, di nav koma gelan da wek wîkesê lal e, nikare heyîna xwe bide xuya kirin.

Kîjan Kurd ji me bixwaze ji bo serxwebûn, pêşveçûn û serbilindiya gelê xwe xebatê bike, berî her tiştî divê serwextî zimanê xwe bibe û di wî warî da gavine fireh û durust rane. Ne wek camêrên ku di navbera çil - pêncî salî di qada xebata welêt da rawestî û dawî serpehatiyên xwe bi tirkî nivîsîn! Ji ber ku herwekî divyabû hînî zimanê bav û kalên xwe ne bûn. Dikarin bi dilekî rihet û bê perwa bêjin ku: Kîjan kurdê têkeve qada xebata welêt û digel zimanê xwe bendewar nebe ew ne gelparêz e, ne dût e ku gelfiroşbe jî.

Heke hinek ji me berî demekê bi ziman mijûl bûne û çêtirî ên mayî tiştin zanîne, ew zanîn gele-

Ma gelo, îro di me Kurdmancan da zimanzan hene?

Em Kurdmanc hemî di warê ziman da nezan û bi şûnda ne. Îro em nikarin li ser kesekî Kurdmanc bêjin ku zimanzan e. Ji ber ku zaravayê Kurdmancî nehatiye civandin û di dibistanan da nedane xwendin û ji hev pij û belav bûye. Di warê wendabûna ziman da gotinek -rehme lê- Celadet Bedirxan hebû, digot: Zimanê Kurdî, herwekî texerekî kayê di nîveka deryayê da valakî, pêlên avê her libeke kayê bi alîkî da bibin. Karê me nivîsevanên Kurd ew e ku, em wan libên kayê bicivînin û vegehinin texer. Çi mîslek baş û di cihê xwe da ye. Zimanê Kurdî li ser dirêjîya babelîskan di navbera 1200 eşîr da belav bûye. Ji ber ku xwendin û nivîsandin pê nebûye, çar zaravayên xweser jê çar bûne, ku xelkê zaravayekî di zaravayên din nagehên.

Li ser rîya beg û axan, şêx û melan ku pêşiya gel bûn, bêjeyên erebî, farsî û tirkî di ziman da cih girtin û bêjeyên Kurdî ji ziman hatine bi dûtîstî. Her eşîrekê hin bêje di nav da mane, ku kê mî caran tîn peyivîn. Ev bêje carna li ser zarê kalemêr û pîrejînen gundî di nav peyvê da diborin. Kesin jîr û serwext hebin û têkiliya wan bi gundiyan ra hebe dikarin wan bêjeyan binivîsin.

kî teng û hindik e, nabe dermanê tiştêkî hêja û durust. Divê ev celeb kes bi çavê zimanzanan li xwe nenihêrin û sinorê zanîna xwe binasin. An na, berradayî xwe navno û bêmirês dîkin. Yek ji vankesan ez im, ku heya îro ji şagirtên ku dersê didim wan hînî bêjeyên Kurdmancî, ên nebihîstî dibim. Bawer im ku pîrrtirî 2000 bêje di zaravayê me Kurdmancî da hê ez nizanim, ku 2000 bêje dikare bibe zimanekî xweser. Ev e zanîna me ya îro di zaravayê Kurdmancî da, çî zanînek tewş û bêkêr.

Çi bextiyariyek mezin e ku îro em dibînin birrek xortên Kurd ên gelparêz federasyonek komeleên Kurdistanê li Swêdê anîne pê û dixwazin ji bo pêşveçûna zimên bixebitin. Ev yeka han, bi qasî ku serê her kurdekî bîrewer bilind dîke, dilê kalekî wek min ji xweş dîke. Tiştê ku îro ji van camêrên han bê te xwestin ew e ku. Bi doz û ramanên siyasî ji hev bi dût nekevin û dev ji xebata zimên bernedin. Divê ew qenc bizanin ku ji xebata zimên çaktir, mezintir û bilindtir nikarin ji bo gelê xwe û serbilindiya wî xebatekê bikin.

Dawî, çî gava neyarên me dîtine hin Kurd ji bo xebateke welatî kar bûne, wê Kurdekî, an hin Kurdin bêbav têxin rex wan xebatkar, çî gava bixwazin, wê xebatê bi destin wan nokeran di hev da diêxin. Em hêvîkar in ku xortên federasyonê ji vê yeka han qenc hişyarbin.

DU ÇARÎN JI OSMAN SEBRÎ

SERBİLINDÎ

Xwe danînim bo stem û zorê,
Divê serbilind ez biçim gorê.
Gava bi rûmet çûme Goristan,
Hêja ye bibim lawê Kurdistan.

EM KURD

Em Kurd nikarin bo rûmetê yekdestî rabin,
Wekî rebenan çav li dest in, bê xwedî nabin.

Xwedî, me divê biyanî be ne ji reha me,
Ji bo zorkeran vekirîbe her keleha me.

DENG DAN

82



19—ê Îlonê, Roja Helbijartinên Gîştî Lî Swêdê

Berê, lî Swêdê mafê dengdanê grêdayî dewlemendi û maldariya kesan bû. Dî dawîya sedsala 19-an û destpêka sedsala 20-an de, piraniya xelkê Swêdê xwest ku mafê hîlbijartin û hîlbijarinê ne bes tenê jî bo kesên dewlemend lê jî bo karker û gundiyan belengaz jî hebe. Cara yekemin, dî sala 1909-an de hemû mêr gihan mafê beşdarbûna hîlbijartinê parlamentoyê. Wê çaxê, kesên ku 24 salî bûn dikanibûn rey (deng) a xwe bîdî. Dî sala 1921-an de, jî jinan re jî mafê hîlbijartin û hîlbijarinê hate dayin. Piştî van guhartinan, guhartîneke dî i girîng hate kirin dî sala 1976-an de; kesên biyani yê 3 salan lî Swêdê bî cih û war bûbûn dê bikanibûna beşdari hîlbijartinê belediyê bîbî. Dî eyî wextê de jî salên beşdarbûna de hîlbijartinan de jî 24 salan daxistî 18 salan. Dî sala 1976-an de jî sedî 60-ê biyaniyan beşdari hîlbijartinê sala 1979-an de hejmarê beşdarbûna wan ket. Bo ku biyani kanibî beşdari hîlbijartinê parlamentoyê jî bîbî i çend caran, jî meclisa Swêdê re pêşniyar hate kirin, lê bî ser neket. Dengdan her çiqas mafekî be jî, beşdarbûn

Dûmahik rûpel 8

Partiyên Sîyasi û Ditinên Wan

Meriv dîkane partiyên ku dî parlamenroyê xwedî kursi ne, bike du bend: 1 benda destê rastê û 2 benda destê çepê. Partiyên lî benda destê rastê ne, ev in :
PARTIYA YEKÎTIYA MUHA-FEZEKARAN (MSP)

Bî kurtebir, navê wan Moderat e. Moderat piştî sosyal - demokratî mezintirîn parti ye. Partiyê muhafezekar ya sermîyandaran e.

Ditinên vê partiyê ev in :

1- Dîvê her kes biryara xwe bî xwe bide. Dewlet pêwîst e têkilî karê insanan nebe. Insan ne wek hev in.

2- Bazareke (sûkekeke) serbest.

Moderat aboriyê ku lî serbingehê sûkeke serbest hatiye avakirin dîparêze. Sedemên ku rewş û jiyana swêdîyan weha xweş û çak e, grêdayî mîlkîyeta xusî ye. Sûka serbest hoyê bîngeha azadîya sîyasi ye. Sosyalîzm û demokrasi du tiştên dij hev in. Sosyal - demokrat bî xwestina xwe ya bo "Fonên karkeran tagarfonder" dîxwazî sistema aborî ya cîvakê bîguhêrin û bîkî wek ya welatên rojhilata Ewrûpa (welatên sosyalîst).

Dûmahik rûpel 9

Mîrov Raya Xwe Lî Ku Der û Çawa Dîde?

Kurdi: E. ZÊRÎN

19-ê meha Îlonê, roja yekşemê, dê dengdan jîbo parlamen-toyê, meclisa bajarî û ya belediyê pêkbê. 17-ê meha Cotmehê, roja yekşemê jî jîbo dengdana meclisa dêrê ye.

MAFÊ BIYANIYAN YÊ
DENG DANÊ

Biyani tenê dîkanî reyî xwe jî bo dengdana meclisa bajarî û ya belediyî bîdî.

Jîbo biyani kanibî reyî xwe bîdî dîvê :

1- Oeyda wi/wê ya dêrê (nîfûsê) 1-ê meha Mîjdara salên 1979, 1980 û 1981 an lî Swêdê hebe.

2- Derengtirîn roja seçimê 18 sal dagirtibe.

3- Tu mahkeme derheq nekami-liya wi/wê biryar nedabe.

4- Navê wi/wê dî listeya deng-daran de hebe.

-KÎ DIKANE BÊ HILBIJAR-TIN?

Her kesê ku hemwelatîyê Swêd e û mafê wi/wê yê dengdanê heye dîkane bo parlamen-toyê, meclisa bajarî û meclisa belediyê bê te hîlbijartin. Biyani, bes dîkanî jîbo meclîsê bajarî û yê belediyî bî tin hîlbijartin. Oeyda meriv ya nîfûsê lî kijan navçeyê be, meriv ancax dîkane

Dûmahik rûpel 11

ne şert e. Dengdan veşari dibe. Ji bo ku kesek du caran dengê xwe nede, divê dema tu reya xwe didi, di lista hîlbiartman de xetekê li teniştê navê te bixin.

HILBIJARTINÊN ÇI ?

Dengdan reya xwe ji parti an ji ninerê wê re dayin e. Her parti, politika ku ew dixwaze pêk bîne, ji xelkê re dide nasin. Derheq rewşa civaki. abori û siyasi xwestin, daxwaz û pêşniyarên xwe bi rîya radyo, televizyon, kovar, rojname û navgînên mina van raberi gel dikin. Carina ji gund bi gund, bajar bi bajar dîgerin, li pîrs û pêşirtengiyên xelkê guh didêrin û derheqê wan da dîtînen xwe dibêjin.

BELEDIYE Û BELEDIYÊN BAJARAN -

Lî Swêdê 279 belediye û 23 belediyên bajarman hene. Her belediye bi gelek meselên civaki dadikeve û wezîfên wan bê hejmar in. Di hin meselan de mafên wan sinorkiri ne. Mesela wek kar û barên xwendegehê ku bi zagonên gelemperi hatine tespît kirin. Di hin meselan de belediye serbixwe ne. Siyasetkarên belediyên derheq meşandin û birêkîrîna kar û barên belediyê, xizmetên dê bê nî kirin û kamçûra ku runiştewanên wê dê bîdî, bîyar dîgre. Ev siyasetkarên han bi dengdanê tînen hîlbiartî. Çend misal ji karên ku divê belediye pê rabî ev in:

1- Dema pê wîst dibe, di dibîstanan de dersên bi zîmanê zîkmaki dide xwendî û sefên bi zîmanê zîkmaki dide damezrandî.

2- Ji bo biyaniyan xizmeta wergerîne pêk tîne.

3- Ji kesên ku rewşa wan ya abori ne çê ye re alikari dîke, dij alkolizmê radiweste û alikariya kirê dîke.

4- Zarokxanan vedîke.

5- Ji bo xortan cihê listîk û lihevhibûnê pêde dîke.

6- Lî muze û pirtûkxanan dînerê û bona pêşvexîstîna çanda civaki alikari dîke.

7- Ji bo rûniştewanên xwe bi cih û war bîke, xaniyan ava dîke.

8- Lî elektrik û ava belediyê dînhêre.

9- Lî şeçam û kolanan dînerê û wan nûjen dîke.

10- Çûnûhatîna di nav belediyê de hêsa dîke, li otobus û metroyê dînhêre.

11- Lî kal û pirên tenê mayî dînhêre. Malên pir û ezepan di de çêkîrî.

12- U bi xwendewariya kesên gihîştî mujûl dibe.

Çend misal ji karên, ku belediyên bajarman divê pê rabî, ev in:

1- Nexweşxane

2- Mîayenexanên navçê

3- Merkeza jîndewariya zarokan

4- Merkeza dayikên xwedî zarok

5- U cihê ku dîranên xelkê ji nexweşiyên dîparêze vedîke û berpîrsiyariya wan dîgre ser milên xwe. Lî Malmö, Göteborg û Gotlandê meclîsên belediyên bajarman tune ne û ji ber wê ji, divê ev pêwîstiyên han belediyên ku li vir hene bîdî ser xwe.


-HATINÊN BELEDIYAN-

1- Kamçûrên ku ji rûniştewanan tînen girtî

2- Hatînen ku ji xizmetên wek elektrîkê, gaza hewê û paqîjiya nav belediyê tînen

3- Alîkariyên ku ji dewletê tînen

Dûmahik rûpel 17




AVAHI Û DAGERÊN BELEDIYÊ

3- Divê sendikayên karkeran bî siyasê mijul nebîn.

4- Divê kamçûr (wêrgî) bê daxistin.

Mesrefa bo kar û xizmetên civakê her ku diçe zêde dibê û ev bî xwe re zêdekirina kamçûrê tine. Bîla her kes lî çara serê xwe bî-nihêre. Divê em destengiyê bîkî û mesrefê wek berê nekin.

5- Divê hîm xwendeghên tevayî û hîm jî yê xusûsî hebîn. Xwendeghên taybetî jî bona xwendevanên jîrek derenceka yekemin e. Dî dibîstanan de bawername (diplome) pêwîst 1, bo ku



Serokê MSP

meriv bîzanibe, bê ku jîrek û jê-hatî ye.

6- Bî zîmanê zîkmakî xwendî divê lî gor xwestîna dê û bavî be. Ku dê û bavên xwendevanên bîyanî nexwazîna bîla zarokên wan bî zîmanê xwe nexwin.

7- Divê lî kêleka nexweşxanên tevayî nexweşxanên xusûsî jî bî vekarîna.



T. Björn Feldin serokê CP

PARTIYA MERKEZÎ(CP)

Pîraniya endamên wê jî gundî

û memûran pêktên. Yek jî armançên wê ev e, ku kar û dagêrên siyasî ne jî cihekî bî gerandî, divê lî pîr cih û organên bî belavkirin û meşandin. Kar û barên civakê divê pîralî bî û ne jî destekî bî gerandî. Rûniştvanên her navçeyê, divê lî gor ho-yên xwe yê ku dest dîde, bîyarên swe bîdî û dewlet zêde têkîlyê neke.

Divê hemû meriv xwedî qîmet û mafên wek hev bî. Jî bona ku sîkeke kar ya serbest lî tevaya Iskandîmawiyê pêkbe, xebatê dîke. Alîgirê pak gîrtî û parastîna xwezayê (tebîetê) ye. Dîjî enerjîya atomê ye. Wezîra bîyanîyan, jî vê partiyê ye.



Ola Ullsten serokê FP

PARTIYA GEL (FP)

Partiyê liberal e. Xwestî û armançên wê ev in :

- 1- Dîjî gîrbûna sektorê dewletê ye.
 - 2- Kesê ku zêde kar dîke divê zêde kamçûrê nede.
 - 3- Divê welatên paşdemayî re alîkarî bê te kîrî.
 - 4- Divê jin û mêr wek hev bî.
 - 5- Ki çî dîke bîla bîke, her kes berpîrsyarê xêr û gunehên xwe ye.
 - 6- Divê radyoyên navçeyî bî vekarîna.
 - 7- Lî dij burokrasyê ye.
 - 8- Divê sendîka nebî endamê partîyan.
 - 9- Bîla dîkan rojên yekşeman û êvaran jî vekarîbî.
- Partiyên ku lî hêla destê çepê ne ev in .



Olof Palme serokê SAP

PARTIYA KARKERÊN SWÊD (SAP)

Jî vê partiyê re partîya sosyal-demokratî tî gotî. Partiyê reformîst e. Lî Swêdê kevîntîrî û xurtîrî partî ye. Dî van 30 salên dawîna de kîrdayîtiya siyasî dî destên wan de bû. Pîştî 1976-an kîrdayîtiya jî destên wan derket û ket destê hêla rastên. Xwestîna vê partiyê ev in :

- 1- Jî her kesî re kar
 - 2- Jî karê wek hev re destmîzîke (ucreteke) wek hev
 - 3- Divê rê lî buhabûna tîştan bê gîrtîna
 - 4- Jî her kesî re dibîstan
 - 5- Divê zarokxanên nuh bî vekarîna
 - 6- Jî bo aşîtiya û bêçekîyê xebatê dîke
 - 7- Divê xwendîna bî zîmanê zîkmakî zêde bîbe
 - 8- "Fona karkeran" (lontagar-fonder) jî bo Swêdê pêwîst e. Çend gotîna derheq "Fona karkeran" :
- Sosyaldemokrat û Yekîtiya Sendikayên Karkerên Swêdê (LO) dî kongrên xwe yêna payîza 1981-an de bîyara bo çarçewa "fona karkeran" stendî. Bîyara ku stendîna weha ye :
- A- Sermîyanê "fona karkeran", Her sermîyandarê karxanê jî sedî 15-20-ê sermîyanê xwe çezenc kîrîbe, ev kar jê re dîmîne. Kara ku jî sedî 15-20-ê sermîyan bîbuhure, pêncyeka wê jî "fona karkeran" re dîmîne. →



Lars Werner serokê VPK

PARTIYA KOMUNIST(VPK)

Ev parti, dî sala 1917-an de hatiye damezrandin. Jî wê rojê he-tan iro hêza şoreşgerî ya civatê pêkaniye. Armançê partiyê daxistina çîna sermiyandar û avakirina bingehên sosyalizmê ye. Hema hema dî her meclisê bajar û belediyên de endamên wê hene û iro dî parlamentoyê de xwediyê 20 parlamenteran e. Partiya Komunist, cara yekemîn li Swêdê pîrsa Kurdistanê ani rojevê. U xwest ku ev pîrsa han bê koma Netewan. Ditnên wê partiyê ev in :

1- Divê biyani beşdari hîlbiyar-tin (dengdan)ên parlamentoyê bibin

2- Divê her zarokê biyani bî zîmanê zîkmaki bîxwine. Cihên ku zarokên biyani lê pîr in, dî-wê sefên xwendinê, yê nî bî zîma-nê wan bî vekirin. Xwedibuna şexsiyeteke netewî, çandî û cîva-kî başkîrî li ser hinbûna zîmanê zîkmaki tê avakirin. Dema biya-niyek zîmanê xwe yê zîkmaki hin bû, wê çaxê dikane bî hesayî zîmanekî dî nî fêr bibe.

3- Aligirê aşitiyê û bêçeki-yê. Divê pêşiyê welatî Skandi-nawiyayê dev jî çekdarbûnê ber-dîn. Dema ev armanca hate bîçih-kîrî, gava duemîn, bêçekbûna Ewrûpayê ye p gava sîsîyan jî bê-çekbûna tevaya dî nê ye.

4- VPK, kamçûreke dadimendi dîxwaze. Divê kamçûrê nî ku lî ser tîştên xwarinê hene bî rakîrî. (Jî wê kamçûrê re "moms" tê te gotin) Kamçûr pêwîst e dî de-meki pêşiya me de raste - rast jî hîlberinê bê te deranin.

5- VPK, dadimendiya kar û cî-vakê dîxwaze, divê her kes xwedî

mafê kar be. Divê kes betal ne-mîne.

6- Divê jî her zarokî re lî za-rokxanê cih hebe.

7- Lî cihên ku biyani pîr in pê-wîst e, damezranên biyaniyan pêk bî nî, bo ku jî pîrs û pêşirte-niyên wan re bî hêsayî çare bê te ditin.

8- Divê lî dij kom û komikên nijadperestên Swêdî xebat bê te kîrî û rê lî tevgera wan bê te grî-tin. Divê rêxîstî, weşan û radyo-yên wan bî nî qedexa kîrî.

9- Karkerên biyani, parçek jî çîna karker ya Swêdê ne.



Li wê navçeyê bê te hilbijartin.

QERTA DENG DANÊ

Dî dawiya meha Tebaxê de qerta dengdanê bî postê jî kesên ku mafê wan yê dengdanê heye re tê şandin. Ger qerta dengdanê ne ketibe destê te, divê tu herî daira kamçûrê (skattehuset) ya navçê û bîrse.

Dî qerta dengdanê de navê te û navnişana te li destê rastê hatiye lêkirin û li destê çepê jî cih û wextê dengdanê hatiye nivisandin.

LI KU Û BI ÇEND AWAYAN MERIV DIKANE REYA XWE BIDE?

1- Li cihê dengdanê, 19-ê Ilonê. Ev jî xwe di qerta te ya dengdanê de jî hatiye lêkirin.

2- Dî navbera 26-ê Tebaxê û 19-ê Ilonê de li postexanê, meriv dikane reya xwe bide. Li kijan derê Swêdê be bila bibe, xem nake. Divê bî te ra Cuzdanê huviyetê û qerta te ya dengdanê hebe, ku tu kanibe reya xwe bîdi.

3- Li nexweşxanan, meriv dikane 12-ê Ilonê reya xwe bide.

4- Li dervayi Swêdê li sefaretên Swêdê jî meriv dikane reya xwe bide. Zûtirin jî 26-ê Tebaxê heta 19-ê Ilonê meriv dikane reya xwe bide.

Bo dengdanê, pêwîst e ku cuzdan û qerta dengdanê bî meriv re hebe.

5- Dî gemiyên Swêdi de, yê li seferên derva ne jî, meriv reya xwe dide. Zûtirin jî 26-ê Tebaxê destpêdike heta 19-ê Ilonê. Raberdayina cuzdan û qerta dengdanê pêwîst e.

—RENGÊN PELÊN REYAN—

1- Rengê pelê reya parlamentoyê zer e û di her quncikê wê de du xetên reş li ser hev hatine kişandin.

2- Rengê pelê reya meclisa bajêr hêşin e û li her koşên wê xetek reş hatiye kişandin.

3- Rengê pelê reya belediyê sîpi ye û tu nişan li koşên wê ne hatiye kirin.

Meriv dikane pelên reyan li cihê dengdanê bîdestxine. Weki din jî her parti li malan belav dikin.



Navên partiyên ku di parlamentoyê de ne li ser van pelên reyan hatiye nivisandin. Li ser hin pelên reyan tenê navê partiyê hatiye nivisandin. Dî hînekên de jî, him navê partiyê û him jî nînerên ku jî aliyê partiyê ve hatine hilbijartin hatiye lêkirin. Tu kijanê bixwazi, dikani wê têxi nav zerfa hindur (li serê îşareta "II" heye) û pişt re jî têxi nav zerfa derva (li ser îşareta "III" heye).

Dema kesek nexwaze an jî nikanibe xwe reya xwe bide, ew dikane bî rîya "nama pelê reyê" dengê xwe bide. Bî kê re meriv dikane "nama pelê reya" xwe bîşîne?

1- Bî destê jîna/mêrê xwe.

2- Jî ber sedemên nexweşiyê, û pîrbûnê an jî seqetbûnê, meriv dikane bide wekileki/ê xwe. Ev kesa/ê han 18 salî be û torin, dê, bav, bra an jî keseki/keseke ku li wi/wê dmêre be.

3- U bî rîya postevan.

Dema tu reya xwe bî rîya "nama pelê reyê" didi, jî te re ev tiştên han pêwîst in:

A- Pelê reyê

B- Zerfa hindur II

C- Zerfa derva III

Dema tu zerfa hindur diki ya derva divê yeki nas (şahid) li ba te be. Ger tu reya xwe bî wekileki/ê re dîşini, divê wekilê te jî li wêder amade be.

Ku pîreka/mêre te "nama pelê reya" te bî xwe re bibe, divê li ser zerfa derva (III) qismê "Alt dagre. Ger bî wekileki/ê re hatibe şandin, divê qismê "Alt B" bê dagirtin. U bî postevan re hatibe şandin pêwîst e ku ew qismê "Alt C" dagire. Pîrsên li ser ruyê zerfa derva ne jî, dê bersîva wana bî dayin û dê nasek bipejirine. Kesê ku dipejirine û imza xwe davêje divê 18 salî be û ne jî/mêr an keç û kurê wi/wê bî. Wekil jî nikanê şahudiyê bîke.

Meriv "nama pelê reyê" berdidê ku derê?

1- Li cihê ku di qerta te ya dengdanê de hatiye lêkirin

2- Postexane

3- Gemiyên Swêdê, yê li seferên derva ne.

4- Sefaretên Swêdê

Ger bî rîya 2,3 an 4 bê te avêtin wê çaxê divê meriv qerta dengdanê şani bide.

ÇÎROK û KURTE-ÇÎROK

ÇIGERXWIN

Bê gomanê, ko Çîrok, weke, ko di her zimanî de perçakîmezî ji Tora wî zimaniye. Wilo jî, di Tora Kurdî de perçakî mezîne.

Çîrok jî, du perçene :

1- Çîrok 2- Serpê hatî ne.

Çava ko çîrok pirê wê jî derewan hatiye çêkirin. Lê (serpê hatî) pirê wê ji rastiye, ko hatiye serê yekî û ji xwere kiriye Çîrok û belavkiriye.

Lê Çîrok jî, du perçene :

Kurte-Çîrok û Çîrok. Lê niha divirde dixwazim hin Kurte-Çîrok ji xwendevanên Berbang re bibêjim :

DÎBÊJÎN :

Rojekê Şêrek li Rovîkî rasthat û dî, ko hirmiyek dinav devê wî de ye. Heme Şêrê ser mezin, ji devê wî derxist û xiste devê xwe û got :

Rovî, ev çi xwarine? û li kîjan daran dikevî?

Rovî bi tore jêre got :

Ezbenî ev hirmiyê û darên

hirmiyên li nav van rezan pirin. Eger mezinê teba ferman bikî ez dikarim darên hirmiyên nîşanî te bidim.

Şêrê ser mezin da pey şopa rovî û çûne binê dareke hirmiyên û Rovî got :

Ezbenî ev tevde darên hirmiyên. Lê mezinê hovan jêre got :

Rovî win çawa hirmiyên dadîweşênin?

Rovî bi tore jêre got :

Ezbenî em dûvê xwe li darê dixin û diweşin.

Lê çiqas Şêrjî dûvê xwe lêxist tenê libek tenejî neketexwarê û bi xeyd got :

Çima nakevin canim ??

Lê rovî ji nûve dest bi serê SERPÊHATÎYÊ kir û bi nermayî jêre got :

Ezbenî hêrz û hinera we Şêran di piştê wê de ye.

Lê çiqas piştê xwejî dayê, tenê libek ji jê neket û care di bi xeyd jêre got : çima nakevin canim

Rovî jêre got : ezbenî hingî tu xurt û bi hêrzî, tu xwe dihejê nî,

De hinekî xwe ragre ezê niha bêm!

Rovî berê laşek dîbo ko se walek li miribû û sivik çû roviyên wê sewalê anîn û ji neynûka wî û ta bi gerdana wî li bejna wî û darê ve girêda û got :

Gereke hinekî rawestî tako hinek ziwa bibi.

Lê hingî ziwa dibû bê tir laşê wî biserhevde dihat guvaştin û bê tir dewêlê ew têşand. Lê her çiqas

Dûmahik rûpel 18

MIRÎŞK û XWEDÊ

MAHMÛT BAKSÎ

Rojek lawirên dinê lihev civiyan û çûn ba Xwedê ji bo gazinê. Pêşî marê destpêkir û got:

—Ezbenî weha nabe. Te min çêkiriye, lê birastî te mala min jî şewitandiye. Ev çî hal e? Ji sibê heya evarê ez bi ser zikê xwe va kaş dibim, diçim û têm. Sitrin, kevir, dahl û devî ez peritandim. Tu gerek çarekî ji min ra bibinî...

Piştê marê bu uuuzina gurê:

—Mar rast dibêje, gurê got. Tiştên te tim tevlihevin. Evê ku teaniye serê min, kes bi serê kesi va naniye. Xwezî te min çênekirbûya heyra. Bivî qismeta teng u tarî ezê çewa zikê xwe têr bikim? Xasma zivistana gava ku berf dikeve erdê ez tim birçî u belengaz im. Eyb e, şerm e ji te ra lo!

Dor hatibu Devê. Deva reben dikuliya û kuxt û zirta wê bu. Ji girînê çavên wî tijî bubu.

—Ma ezê ji te ra çî bêjim, Devê got. Tu bixwe halê min dibinî. Te tû derekê min rast çênekiriye. Piştê min, stûyê min, lo hasili her derên min ne li hevîn. A ku pîrr li zora min diçe, Te navê min jî xistiye Quranê. Goya ez lawurekê piroz im. Lê xwêlî li serê min be ku rêberê min ker e. Ez bi vî bejna xwe ya gîrgiri didim pey kerê û diçim û têm. Hem Quran û hem ker!...

Dûmahik rûpel 18

HEVPEYIVÎNEK BI

M. E. BOZARSLAN RE

»PARÇEKÎ BERNAMA MIN
XEBATA LI SER KOVARÊN
KURDAN E»

ŞOREŞ ZİREK


PIRS— Em dibinin ku alfaba kurdi cara duemin, lê icar li dervayi welêt çap bû. Ji kerema xwe, dikari ji me ra li ser alfabe û çapa we ya duemin hinek tiştan bîbêji?

BERSIV: Dema ez hatim Swêd, min dit ku ihtiyaca Kurdan li Swêd ji û li welatên din ên Ewrûpa Rojava ji bi alfabe û bi pirtûkên kurdi yê n dîn heye. Sala 1979'an min muraceetê meqamên Swêd ên resmi kir ku ji bo çapkîrîna alfabe li Swêd imkan bîdin. Meqamên Swêd daxwaza min qebûl kirin û jibo çapkîrîna alfabe alikariya mali dan pirtûkxana 'Invandrarförlaget'. Ev pirtûkxana li bajarê Borås e û bi pirani pirtûkên bi zimanên biyani derdixe. Bi vi awayi çapa diduyan a alfaba kurdi payîza sala 1980'yi li Swêd derket.

Iro em bi dîlşayi û kêfxweşi dibinin ku hem li Swêd, hem ji li welatên din ên Ewrûpa Rojava mezin û zarûkên Kurdan alfabe dixwînin û di dersên zimên da bikartînin. Lê ji aliki dîn ve ji em xemgîn in ku gelê Kurd li Kurdistanê hêj ji nîkare alfaba kurdi yan ji pirtûkên kurdi yê n dîn bixwîne, di binê zordestiya qolonyalîstan da bi hovitiyeke dijwar ji vi heqê xwe yê biçûktirîn ji bêpar tê hîştin. Em hêvidar in ku di demeke ne dîr da ev zordesti ji ser gelê me rabe û ew ji wek hemi gelên cihanê bikare zîman û bêje û çanda xwe bi serbestî bikarbîne, pêşta bibe û bikemilîne.

PIRS— dema te çapa duemin ya alfabe hazir dikir, guhartin an pêştaxistînen te yê n nû bûn an na? ji ber ku di navbera herdu çapan da bi kêmani deh sal derbas bûbû.

BERSIV: Sala 1967'an dema min alfabe hazir kir, zêdeyê salekê ez li serê xebîtim. Ku em binin bira xwe ku alfabe 64 rûpel e, eşkera dibe ku salek xebat li serê pirr e, tewr zêde ye ji. Belam, min dixwest ku alfabe bi awaki mukemmel derkeve û ji hinbûna xwendin û nivisina kurdi ra bi awaki hêsantirîn bibe a



likar. Ji bo ku ez vê daxwazê pêkbinim û bigijim ve amancê, ez hem li ser şîweyê (metod) wê û hem ji li ser bijartin û nivisina peyvîk (kelime), pevek (berhevok, cumle) û parçemetnên wê gelek sekinim û xebîtim. Ez bawer dikim ku piştê vê xebata dîr û dirêj, alfabe bi awaki wisa derket ku bi kêrê ihtiyaca gelê Kurd tê.

Ji ber vê yekê min pêwîst nedit ku ez tê da tu guhartin çêkim, yan tişt na jê derxim, yan ji tişt na lê zêde bikim.

Belam tişteki dîn heye ku min divê ez bêjim. Ew ji ev e: dema min çapa pêşîn derxist, ji aliyê rêzîmanî û ji aliyê rênivisîyê (îmla) ve hin şaşî û xeletî qewimibûn; her weha hin şaşîyên rêzkirîne û çapê ji tê da derketibû. Di çapa diduyan da min ev şaşî û xeletî gişt rast kirin. Bi vi awayi, çapa diduyan ji ya pêşîn rasttir, têkûztir û paqjîr derket. Ji aliyê teknîki ve ji çapa diduyan gelek hêja çûbû.

PIRS— Ji bo pêştaxistîna zîmanê kurdi divê mirov çî bike, gelo kîjan rîyan bîbine ku zîmanê me bibe zîmanekî dewlemendtir, pêşketî û zîmanê nivisîne? Ango çêkirin û çapkîrîna alfaba kurdi gaveke hêja ye, lê ne bes e. Divê mirov bi kîjan metodan wan gavên hêja zêde û bi rêk û pektir bike?

BERSIV— Jibo pêştaxistîna û dewlementîrkirîna û têkûzkirîna zîmanê kurdi, ji xwe çapkîrîna alfabe û çand pirtûkên dîn ne bes e. Gerçî çapkîrîna vana, ber bi pêşdaxistîna zimên ve gavên baş û mefada in; lê belê ev gav, jibo gihana amancê çim nakin. Di vê rê da divê ku hin gavên dîn ên girîng û pêwîst bînin avêtin.

B- Beriya ku ez li ser van gavan ditînen xwe bîdim zîman, min divê ez li ser mesela 'dewlementîrkirîna' a zîmanê kurdi çasek bisekinim:

Zîmanê kurdi di eslê xwe da, xasma ji aliye pirriya kana (kaynak, hazine) peyvîkan û idyûman ve zîmanekî gelek dewlemend e. Em dikarin vê dewle-

mendiyê bî rewşa Kurdistanê ya coxrafî û civaki û siyasi izah bikin. Weha:

Kurdistan ji parçexeki pîrr asê pêkhatiye; pîrraniya welêt çiya ne. Mirov dikare bêje ku Kurdistan hema hema ji çiyên pêkhatiye. Li gora vê rewşa coxrafî, iqlîmê Kurdistanê ji gelek dijwar e, zivistan hem sar e û hem ji dirêj e. Ji ber vê rewşa dijwar, di sedsalên buhuri da çûyîn-hatîn, dayîn-standîn, kirîn-firotin di navbera hêlên Kurdistanê yê cure-cure da pîrr çênebûye; kitlên gelê Kurd, li hêlên welêt ên ji hev dûr, nekarine bî hêsani herin li hêlên din bigerin, kitlên li hêlên din bibinin, bî wan ra bîpeyvîn û bîdîn-bîstînin.

Ji alîki dîn ve, çawa ku em dîzanin, rewşa gelê Kurd a civaki eşîri bûye: nuha ji eşîri li pîraniya Kurdistanê berdewam e. Eşîri bî xwiyê (karakter) xwe û binyade (bunye,) xwe rewşeki cudaker e; nahêle yekîtîya siyasi di nava kitlên gel da çêbibe, rîya yekîtîya siyasi dîrtîmine. Bî rasti eşîri bî xwe, hebûna wê bî xwe di vê rê da rîtmeke gran û girîng e. Em hemî dîzanin ku di sedsalên buhuri da ji di vê sedsala me da ji li Kurdistanê bî hezaran, belki ji bî tevayî bî sed hezaran Kurd bî destê Kurdan hatîne kuştin. Ji rûyê vê rewşa cudaker û xwini, pêgirtiyên (mensûb) eşîrekê nekarine û newêrine bî hêsani biçin hêla eşîra ku navê wê danine 'dîjmin'. Belki ji peyva pêşîyan a 'sino-rê mêran bî bihustan parvekîri ye' li ser vê rewşê hatiye gotin.

Ji aliyê siyasi ve ji rewşa Kurdistanê li ber çawan e. Parçekirina welêt, bûye rîtmeke gelek girîng, tewr bûye rîtma girîngtrîn li pêşîya yekîtîya siyasi. Her wek ku em hemî dîzanin, Kurdistan cara pêşîn sala 1639'an di navbera herdu împaratoriyan gewre, împaratoriya Îranê û Împaratoriya Osmani da hatiye parçekirin û parvekirin. Parçekirin û parvekirina diduyan û texribkartir ji piştê şerê giştî yê cihani qewimî û Kurdistanê Rojava ya ku heta wê demê di binê nîrê Osmaniyan da bû, îcar di navbera qolonyalistên Tirk û Înglîz û Fransîz da hat parvekirin. Paşê, qolonyalistên Înglîz û Fransîz herdu parên xwe teslimê Ereban kirin û çûn. Ereb bî wi awayî li ser mirasa wan herdu dewletên emperyalîst rûniştin û di şûna wan da ew bûn qolonyalist û du parçên Kurdistanê dan binê gîzmên xwe.

Ji ber van samedên sereke û hin samedên din, yekîtîya siyasi di Kurdistanê da pêknehatiye, her weha yekîtîya zimên ji pêknehatiye. Belam ji alîki dîn ve, gelê Kurd li her derê Kurdistanê, jibo pêkanîna ihtiyaca xwe ya maddî û manewî gelek peyvîk û idyûm afirandine û bikaranîne. Bî deh salan û bî sed salan vê afirandîna dom kirîye, iro ji dom dîke.

Bî wi awayî li gelek hêlên Kurdistanê jibo yek manakê gelek peyvîk hatîne afirandin. Lê belê, ji ber ku yekîtîya siyasi li welêt pêknehatiye, çûyîn-hatîn û dayîn-standîn di navbera hêlên welêt ên cure-cure da çênebûye, pîraniya wan peyvîkan herêmi mane; yanî her bîrek ji wan tenê di herêmekê da tîn bikaranîn, lê li hêlên din nayên zanîn û nayên bikaranîn.

Şertê pêşîn jibo pêştaxistîna û têkuzkirîna û kemulandîna zimânê kurdi, berhevkirîna û nivîsîn û çapkirîna wan peyvîkan e. Belam heta nuha jibo vi karê gi-

ring û pêwîst, îmkân nehatiye dîtin. Lewra dewletên ku Lurdistan dagir kirine ne tenê qolonyalist in, lê di eynê wextê da ji rehkar (şovenîst) in, pişaftîna netewê Kurd ji xwe ra kirine amanc û jibo ku bigîjin vê amancê bî hemî hêz û îmkân û wasîteyên xwe dixebîtin da ku zimân û bêje û çanda kurdi bîmirînin, tune bikin. Yek ji şîweyên hovîtîya wan ji qedexekirîna lêgerrîn û lêkolînên li ser zimânê kurdi ye. Nahêlin ku zimanzanên Kurd û Kurdnasên biyani li Kurdistanê bigerin, peyvîk û idyûm û wd, berhev bikin, li ser wan bixebîtin û wan çap bikin, li nava gelê Kurd belav bikin.

Ji rûyê vê rehkarî û hovîtîya wan, ew xezîneyên zimânê kurdi heta nuha di çiyên xwe da mane; bî mayîna wan ra dewlemendîya zimên ji veşari maye. Eger rojek Kurdistan bî awakî bigîje rewşeke serbest û azad, îmkânên berhevkirîna peyvîkan li hemî hêlên welêt bî dest bîkevin, ez bawer dikim ku jumara peyvîkên kurdi dê bigîje nêzikê sed hezari.

Nexu, zimânê kurdi di eslê xwe da zimânêki dewlemend e; belam ev dewlemendîya wi hêj veşari maye, negihaye gel û li nava gel belav nebûye.

Em îcar werin ser şola ku mirov çawa dikare zimânê kurdi pêşta bixê, têkûz bike û bike zimânêki hevdem.

Bî dîtin û bawerîya min, jibo gihana vê amancê, gerek xebat li ser wan nuqtên jêrin bê kirin:

1- Beriya her tiştî, divê ku peyvîk, idyûm, peyvên pêşîyan û stranên kurdi bî berhevkirîna. Wek ku li jor ji min got, gerçî lêgerîn û berhevkirîna wan tiştan li Kurdistanê bî xwe, iro bêmkûn e. Belam, rewşa Kurdistanê ya siyasi û zordastiya dijminan wisa ku gelek Kurd ji herçar parçên Kurdistanê û ji hemî hêlên herçar parçan derketîna derê welêt, bî pîrani ji li welatên Ewropa Rojava dîjin.

Her weha li Ewropa çend zimanzan û nivîskarên Kurd ji hene. Eger ev zimanzan û nivîskarên Kurd bî karîna xebateke tevayî (kollektîv) bikin û li gora bernameke (program) zanistî bixebîtin, mîmkun e ku peyvîk û idyûm û peyvên pêşîyan bî pîrani ji nava Kurden derê welêt bî berhevkirîna, bî çapkirîna û li Ewropa bî belavkirîna, li gora destdana îmkânên bî şandîna welêt ji.

Eşkera ye ku zimanzan û nivîskarên Kurd bî xwe ser nîkarîna li her derê Ewropa Rojava bigerin û bî hemî Kurdan ra yeka-yek bîpeyvîn. Lê belê, eger ew dest bî xebateke weha tevayî bikin, bî kêmayî xebateke weha bîdîn ber xwe, hîngê hin xwenda û xwendekarên Kurd ji dikarin alîkarîya wan bikin, peyvîk û tiştên din belav bikin û ji wan ra bîşînin. Bî wi awayî, bî doma dirêj, berhevkirîna peyvîkan mîmkun dibe. Disa ne mîmkun e ku peyvîk û idyûm û peyvên pêşîyan hemî, ji sedî sed bî berhevkirîna; ev ancax bî xebata domdirêj a li Kurdistanê mîmkun dibe. Lê belê, ku li Ewropa di vi babetî da xebateke ciddî, tevayî, zanistî û şîwekî (metodîk) bê kirin, mirov bawer dîke ku ji sedî 80-85'ê peyvîk û idyûm û peyvên pêşîyan dê bî berhevkirîna.

2- Ji ber ku zimânê kurdi xasma (bilhassa) li Kurdistanê Jorin ji sala 1923'yan vir da hatiye qedexekirîna û fersenda xebatê ji li serê nehatiye dayîn, ji aliyê teriman ve zimên gelek paştî maye. Em gerek vê rastîyê qebûl bikin ku terimên siyasi, civakî, abû-

ri, tıbbi, zanıstî û hwd, dî zımanê kurdi da, xasma dî zaravê Kurmanci da hema hema çet tunın. Belam ev, ne qusûr û kêmayî ye jıbo zımanê kurdi; wek ku mın çasek lı jor jı got, ev tunebûn, jı ber wê rewşa dijwar e ku zimên tê da ye. Terimên tu zımaneki jı xwe ber naafirın û neafirine; terimên her zımani bı destê zımanzanên wı zımani tên peydakırın û saz-kırın.

Em dema lı rewşa zımanê tırki ya beriya 50 salı dınêrın, em dibın ku temamê terimên wı zımani bı Erebi, Farisi û Fransızı bûne. Lê belê, bı xebata zımanzan û niviskarên Tırk dı nava 'Sazgeha zımanê tırki (Turk Dil Kurumu) da, pıraniya wan terimên biyani jı zımanê tırki hatine paqjkırın û dı şûna wan da terimên tırki hatine saz-kırın. Dıgel vê xebata ku Sazgeha Zımanê Tırki bû 50 sal e dıke jı, zımanê tırki hêj bı temami jı peyvık û terimên biyani nehatiye paqjkırın.

Bı ditına mın, yek jı gavên pêştaxıstın û têkûzkırın û kemilandına zımanê kurdi jı peydakırın û saz-kırına teriman e. Lê belê, ev kar bı xebata yekani (ferdi) nabe û naçe seri; yani nabe ku her kesek, yan her kovarek, yan jı her komelek jı xwe ber, çawa bê aqlê wı wısa teriman çêke. Eger weha be hingê hem berdan-berdan dıkeve zimên, hem jı dıbe ku hin şaşî û xeletiyên girıng bıçewımın. Dema peyvık û terimên şaş dı nava gel da, yan jı dı nava xwendan da ci bıgırın, paşê rakırına wan û guhartına wan bı yên rast gelek zor dıbe û gelek jı wext dıxwaze.

Lı gora baweriya mın, peydakırına teriman ancax bı xebata zımanzanên Kurd a tevayî mımkun dıbe. Ev xebat jı dıvê ku lı ser rêke zanıstı, bı awa û şıweyên zanıstı bê meşandın.

3- Nıvisına pirtûkên bêjeyi (edebi) jı dı rıya pêştaxıstına zımanê kurdi da gaveke girıng e. Xasma kurteçirok, çirok meselok û piyesên kurdi, hem dı fêrbûna zimên da, hem jı dı hinbûna xwendın û nıvisinê da roleke mezın dilızın. Gerçı heta nuha gelek helbestên kurdi hatine nıvisin, lê jı aliyê bêjeyê dūznıvis (nesir) ve, yani dı meydana kurteçirok û çirok û piyesan da valayıyeke girıng dı zımanê me da heye. Dıvê ku niviskarên Kurd bala xwe bıdın vê valayıyê û jıbo dagırtına wê bıxebıtın. Ev jı ancax bı nıvisına van tewırên bêjeyi, yani çirok û wd. mım-kun dıbe.

Lı vır ez dıxwazım tılıya xwe bıdım ser nuqteke girıng. Ew jı ev e: dı nıvisinê da, xasma dı nıvisına pirtûkên bêjeyi da, dıvê ku zımanêki sade, yani zımanê xelqê bê bıkaranın. Lewra gerek em bızanın ku her tıştê ku tê nıvisin jıbo gel e; loma jı gerek ber bı gel be û bı awaki wısa bê nıvisin ku gel bı hêsani bı-kare bıxwine û têbıgıje. Eger ev nuqte bı ser guh ra bê avê tın, hingê tıştên ku tên nıvisin dê dı nava kesên xwenda da bıminın, pıraniya gelê Kurd wê nıkarıbe wan bı hêsani bıxwine û jı wan mefader bıbe. Hal ew e ku amanc, fêrkırın û hinkırın û serwextkırına gel e. Loma jı gerek zımanê nıvisinê zımanê gel be.

Semedê ku ez lı ser vê nuqtê û lı ser girıngiya wê dısekınım ev e: van salên paşın dı nava xwendayên Kurdan da cereyana 'paqjkırına zimên, bı peyveke dın cereyana 'kurdiya xwerû' belav bûye; bı tesira vê cereyanê gelek peyvık û terimên nû hatine 'çêkırın', yan jı em dıkarın bêjin ku hatine 'icatkırın'. Hin jı van peyvık û teriman rast in û lı bingehokên rêzımanê tên;

lê gelek jı wan jı hem lı gora bingehokên rêzımanê û hem jı lı gora pratika zimên şaş in, xelet in, tewr em dıkarın bêjin ku çewt in.

Elbet paqjkırına zimên jı peyvıkên biyani (xerib) pêwıst e. Lê belê ev paqjkırın û peydakırına peyvıkên kurdi dı şûna peyvıkên biyani da, dıvê ku bı xebata tevayî ya zımanzanên Kurd be. Dıvê ku zımanzanên Kurd lı hev bıcıvın, bı xebateke zanıstı û tevayî, bı lêgerin û lêkolin û şıwar (munakaşa) vi karê girıng pêkbinın.

Rewşa kovarên kurdi yên ku lı derê Kurdistanê derdikevin lı ber çavan e; hema hema her kes jı 'gırani'ya zımanê wan gazınc dıke. Çıma? Lewra niviskar û ber-pırsyarên van kovaran zor dıdın xwe jı, zor dıdın zimên jı jıbo ku kovarên xwe bı 'kurdiya xwerû' derxın; bı vê daxwazê jı gelek peyvıkên 'icatkırı' bıkartının ku ev peyvık dı nava gel da û dı zımanê gel da tunın.

Eger dı pirtûkên bêjeyi da jı peyvıkên weha bên bıkaranın, hingê rewşa wan pirtûkan jı dê bıbe wek rewşa kovaran; her kes dê jı 'gırani'ya zımanê wan jı gazınc bıke û ew pirtûk dê negıjın amanca xwe. Yani kitlên gel dê nıkarıbın wan bı hêsani bıxwinın.

4- Nıvisına pirtûkên bêjeyi jı ne bes e. Dıvê ku ev pirtûk lı nava gel bên belavkırın, û gel, xasma xort û keçên nûgıhayı û zarûk jıbo xwendına wan bên teş-wıqkırın. Gerçı dı rewşa iroyın da belavkırına pirtûkên kurdi lı Kurdistanê, xasma lı Kurdistanana jorın pırr zor tewr bêmkûn e; belam dı derê Kurdistanê, mesela lı Ewrûpa ev kar hêsan e. Eger Kurdên derê welêt xwendına kurdi hin bıbın û bı hêsani bıkarın pirtûkê bêjeyi bıxwinın, zewqê pirtûkên bêjeyi dê hin bı hin lı nava gel belav bıbe. Sıberoj dema ku rewş lı Kurdistanê piçek nerm bıbe, kesên ku ve-gırın welêt lı wir jı dıkarın alıkarıya gel bıkın û xwendinê lı nava gel belav bıkın.

5- Yek jı gavên pêştaxıstın û têkûzkırın û kemilandına zımanê kurdi jı, nıvisına zaravê Sorani bı tipên latini ye. Çawa ku em hemi dızanın, ev zaravê zımanê me lı Kurdistanana jêrın û lı Kurdistanana Rojhılat tê peyvın. Xasma lı Kurdistanana jêrın gelek pirtûkên bêjeyi yên hêja û rûmetbılund jı derketine, Belam, jı ber ku dı zaravê Sorani da tipên erebi tên bıkaranın, Kurdên ku bı van tıpan nızanın nıkarın wan pirtûkan bıxwinın û jı wan mefadar bıbın. Hal ew e ku tipên erebi dı eslê xwe da lı zımanê kurdi nayên. Dı rewşa iroyın da lı wan herdu parçên Kurdistanê jı imkana guhartına tipên erebi bı tipên latini tune. Lê lı Ewrûpa ev imkan heye. Hevalên niviskarên ku bı zarave Sorani dınvısin, dıkarın eserên xwe lı Ewrûpa bı tipên latini çap bıkın û lı nava kurdên derê welêt belav bıkın. Bı çapkırın û belavkırın û xwendına pirtûkên Sorani bı tipên latini, hem herdu zaravên me yên sereke Kurmanci û Sorani nêzikê hev dıbın, hem jı peyvıkên ku dı her zaraveki da hene hêdi derbasê zaravê dı jı dıbın.

Dı vi babeti da, Kurdên ku bı zaravê Kurmanci dıpeyvın û dınvısin jı dıvê ku piçek xwe bılvıvının û bala xwe bıdın ser zaravê Sorani jı; pirtûkên ku bı vi zaravê me derdikevin bıxwinın, jı wan mefadar bıbın. Her weha, hevalên ku bı zaravê Sorani dıpeyvın û dınvısin jı, dıvê tipên erebi bıterıkının û qebûl bıkın ku ew tip lı zımanê me nayên. Em hemi gerek qebûl bıkın ku zımanê netewê Kurd ne Kurmanci ye û ne jı Sorani ye, lê 'Kurdi' ye; dı zaravê Kurmanci da çı

hebe ew malê netewê Kurd e, dî zaravê Sorani da ji çî hebe ew ji malê netewê Kurd e.

PIRS— Her weha du pirtûkên te yê nû ji, »Mir Zoro» û »Gurê Bilûrvan» in. Wek em têgihîştin, ev pirtûkên zarokan ji dê dom bîkî û bîbî rêzek. Gelo bo çî te hewceyi dit ku pirtûkên zarûkan binivîsi? Gelo girîngiya pirtûkên zarokan çî ye?

BERSIV— Belê, 'Mir Zoro' pirtûkeka zarûkan e û dî rêza 'Meselokên Lawiran' da pirtûka pêşin e. Sebebê ku min hewceyi dit ku ez pirtûkên zarûkan binivîsim ev e:

Çawa ku her kes dîzane û çebûl dîke, şitlê (nesl) tewri cîwan û teze yê her neteweki, zarûkên wi netewi ne. Zarûkên iroyin cîwan û mezinên sibeyin in. Bî ditma min, jîbo her netewi, xasma jîbo neteweki wek me bîndest û beşxwari, yek ji wezîfên herî girîng, belkî ji wezîfa girîngtirin ev e ku zarûkên xwe li ser tore (tradition) û zîman û bêje û çanda xwe bigihîne. Peyveka Ereban heye wergerana wê bî Kurdi weha ye: 'Zanina dî biçûkiyê da wek nexşê li kevîran e, zanina dî mezîniyê da wek nexşê li kelpîçan e'.

Yani nexşê ku li ser kevîran bê kolan û bê çêkîrîn çawa ebedî dimîne, bî tesîra ba û baran û berfê xîrab nabe û namehe, zanina ku dî biçûkiyê da mirov digre ji wîsa dî dilê mirov da ci digre, dî mejîyê mirov da kar dîke, saxlem dimîne, jî mirov ra dîbe meleke û êdî jî bîra mirov naçe. Jî aliyê din ve, nexşê ku li ser kelpîçan tê xêzkîrîn çawa ebedî namîne, bî tesîra ba û baran berfê dîmehe û dîpîrîşe û wînda dîbe, tîştê ku mirov dî mezîniya xwe da hin bîbe ew ji wîsa bêbingeh e, sist e û her tîm dî tehluka windabûnê da ye, zû jî bîra mirov diçe.

Amanca min jî nivîsîna pirtûkên zarûkan ev e ku ez li gora hêza xwe û li gora zanîna xwe jî zarûkên Kurdan ra bîbîm alîkar û jî wan ra xîzmetekê bîkîm ku bîkarîn bî zîmanê xwe yê netewî bîxwinî, demîna (hinbûn) xwe li ser zîmanê xwe bigrî û jî biçûkiyê ve hewesa xwendîna kurdi jî wan ra çêbibe.

Lê belê, eşkera ye ku zarûk bî xwe nîkarîn pirtûkan bîxwinî. Dîvê ku dî destpêkê da mezin alîkarîya wan bîkî û wan hinê xwendîna pirtûkan bîkî. Ku zarûk carekê hin bîbî, êdî bî xwe dîkarîn bîdomînî.

Tîştêki dîn jî heye: 'Mir Zoro' û 'Gurê Bilûrvan' û pirtûkên dîn ên ku dî vê rêzê da wê derkevî, erê pirtûkên zarûkan in, lê ev pirtûk jî mezinan ra jî dîbî. Jî ber ku pirtûkên kurdi yê bêjeyî pîr û pîr kê mî in, ihtîyaca Kurde mezin jî bî pirtûkên weha heye; ew jî dîkarîn van pirtûkan bîxwinî û jî wan mefadar bîbî, hinbûna xwe li ser xwendîna kurdi bî alîkarîya van pirtûkan pêşta bîbî.

PIRS— Dî »Mir Zoro» û »Gurê Bilûrvan» de meselokên lawîran hatîne nivîsîn. Dî nav gelê me de meselokên lawîran hene. Her weha dî nav gelên dîn yê Cihanê de jî meselokên wîsa hene. Gelo bo çî te ev metod bîkarîni?

BERSIV— Ez dîkarîm semedê bîkarînîna vi metodî dî sê nuqtan da îzah bîkîm:

1- Dema mirov bîxwaze û bîxêbite ku zarûkan hinê xwendî û nivîsîna zîmanê kurdi bike û dî dilê wan da zewq û hewesa xwendî û bîcî bike, berîya her tîştî

gerek mirov tîştên wîsa binivîse ku zarûk jî wan zewq bîstînin, wan bîevînin, bî kêf li wan guhdari bîkî û bî hewes wan bîxwinî, li wan û li tîştên wek wan bîgerî. Her wek ku her kes dîzane, kêfa zarûkan jî her tîştî pîrtîr jî tebiet û heywanan ra, xasma jî lawîran ra tê. Mirov dikare bêje ku dî jîna zarûkan da dema şêrîntîrî û xweştîrî ew dem e ku dîya wan, yan jî dapîra wan serê wan dîde ser çoka xwe û jî alîki ve serê wan dimale, jî alîki ve jî bî wî zîmanê xwe yê şêrî û têrevî jî wan ra meselokên lawîran dîbêje. Zarûk dî wê demê da her tîştî jîbîr dîkî, bî xîyala xwe adeta dîkevî dînyake dî; bî şêr û gur û hîrç û roviyan ra dî nava darîstanan da digerî, bî kewan ra li ser zînanan dîqîbî, bî teyrînan ra li hewa dîfîrî. Şopên ku ev meselok û xîyal dî dilê zarûkan da dîhêlî, wek nexşên ku li ser kevîran bê kolan, adeta perçî dîbî û wîsa dimînî.

Digel ku dê û dapîrên Kurd, van meselokan jî zarûkana devkî (bî dev) dîbêjî û tu wêne jî tunî ku nîşanê zarûkan bîdî, dîsa jî ew meselok dî dilê zarûkan da şopên weha kûr dîhêlî. Îcar em bîfîkîrî ku meselok dî pirtûkan da jî zarûkên biçûk ra bê xwendî û wêneyên wan bî zarûkan bê nîşandan, zarûkên ku dî dema xwendîna da ne jî bî xwe bîxwinî, dê tesîreke çawa li zarûkan bike û zewqêke çawa bîde wan.

Amanca min jî nivîsîna van meselokên lawîran ew e ku ez vê zewqê û vê hewesê bî rîya van meselokan bîdîm zarûkên Kurdan.

2- Amanca dîduyan jî ev e ku ez van afirandî gelê Kurd binîm ser kaxîd û bî şîweke hevde û nûjen binivîsim. Afirandoxê van meselokan dî eslê xwe da ne ez im, gelê Kurd e. Çawa ku min dî pêşepîya (pêgîtin) 'Mir Zoro' da jî ragîhandîye, tîştê ku min kîrîye min ev meselok berhev kîrîne û bî şîweke nûjen nivîsîne.

Bêjeyê nenivîsî heta neyê nivîsî û nekeve ser kaxîd, her tîm dî tehluka mîrîne û windabûnê da ye. Ev tehluka, xasma jîbo bêjeyê nenivîsî yê geleki wek gelê me yê bîndest, hin pîrtîr e. Ev meselokên lawîran jî, beşek jî bêjeyê kurdi yê nenivîsî ne. Ez dîxwazîm ku bî nivîsîna wan, wan jî tehluka windabûnê û jîbîrbûnê bîparêzîm. Pîştê ku ketî ser kaxîd, dî pirtûkan da çap bûn û li derê Kurdistanê be jî dî nava gel da belav bûn, êdî namîrî û wînda nabî; rojek hemî dê li Kurdistanê jî tîkevî destê gelê Kurd û li nava gel belav bîbî.

3- Çawa ku te jî dî pîrsyarê da got, meselokên weha dî nava gelên dî da jî hene. Gelên dî, jî ber ku ne wek gelê Kurd dî binê şertên gran da ne, meselokên xwe û hemî tewîren bêjeyê xwe yê geli nivîsîne, çap kîrîne, belav kîrîne; gelek meselokên gelên dî, bî hin zîmanên bîyanî hatîne wergerandî û bî vi awayî dayî-standîna bêjeyî çandî dî vi babetî da jî dî navbera gelan da çêbûye û pêşta çûye.

Ez bî nivîsîna van meselokan dîxwazîm îspat bîkîm ku gelê Kurd jî xwedîyê bêjeyekê weha ye, qabiliyeta gelê Kurd jî jî afirandîna tîştên weha ra hebûye û heye, dî vi babetî da gelê Kurd jî gelên dî ne kêmtîr e.

PIRS— Jî kerema xwe, li ser pirtûkên zarokan yê ku wê derkevî, hinek înfîrmasyon dîdî?

BERSIV— Pîştê 'Mir Zoro' û 'Gurê Bilûrvan' Pirtûka sîsîyan 'Kêz Xatûn' e. Ew jî heta dîwayîya 1982'

Dûmahik ji rûpel 8

PERGAL Û GERA BELEDIYÊ

Her kesê ku li navçeyeke xuya rûdnê, girêdayi belediyekê ye. Pêwistiyên ku her belediye pê radibe, ji hêla daire û dageran tîn meşandin.

Meclisa Belediyê

Organa mezintirina belediyê, ya bîyardayînê ye. Endamên meclisa belediyê ji sê salan carekê tîn hîlbijartin. Endamên wê ji partiyên ji hev cuda pêktên. Di meclisa belediyê de, partiyek çiqas zêde xwedî kursi be, ew qas ji xwedî gotin e û dikane siyaseta xwe tî de bi cih bike.

Dagera Belediyê:

Lî her belediyê dagereke belediyê heye. Mijarên (mewzûyên) ku di meclisa belediyê de li ser

tîn peyvin, ji hêla dagera belediyê vetên amadekirin. Lî gor piraniya reyên ku her partiyê girtiyê, endamên wê de vêder de cih dîgrin. Endamên dagera belediyê ji hêla meclisa belediyêve tîn hîlbijartin.

Dagerên Belediyê:

Bo ku belediye pêwistiyên xwe binin cih, birek dager hatne damezrandin. Dager ji siyasetka-

ran pêktên, lê karên dageran memûr dimeşin û ew bi hîlbijartinên siyasi ne hatne hîlbijartin. Her dager berpirsiyariya kareki belediyê daye ser milên xwe. Lî belediya ku tu lê rûdnêyi endamên meclisa belediyê tîn tespîtkirin û hîlbijartin. Ev meclisa han paşê endamên tevaya dageran hîldibijêre.

PERGAL Û GERANDINA MECLISA TEVAYIYA BAJÊR

Dagera merkezi ya meclisa tevayiya bajêr:

Mezintirin organa bîyardayînê ya meclisa tevayiya bajêr e. Mina parlamento û meclisên belediyên ev ji, ji siyasetkarên partiyên pêkhatiye. Endamên wê ji sê salan carekê tîn hîlbijartin.

Sazenda Dagerê:

Mijarên ku meclisa tevayiya bajêr dê li ser rawest e, pêşkêş dike. Dervayî wê hin dagerên ku li jindewariyê û nexweşiyê dînhêrînan, dagera çandi, दौरا kardayîne û dagera çavdêriyê ji hene.

yan dê bê çapkîrî. Pirtûka çaran 'Bîndestîya Şamiyan'e. Ez texmin dikim ku ew ji dê di sala 1983'yan da derkeve. Pirtûka pêncan ji vê rêzê, min hêj nav lê danîye. Ew ji di dûwayiya 1983'yan da, yan di dîstêpêka 1984'an dê derkeve.

Bi vi awayî di rêza 'meselokên lawîran' da dê pênc pirtûkêk temambîn.

Piştê temambûna vê rêzê, ez'ê çend pirtûkên kurteçirokan ji jîbo zarûkan bînvîsîm. Lê belê, ew'ê ne meselok bî; ew'ê çirokên zarûkan ên hevdem bî. Ez guman dikim ku ew ji dê bîbîn 5-6 pirtûk.

PIRS— Pirtûkek te ya nû ji »Meyro« ye. Lê qasê ku em dîzanin »Meyro« cara yekem li Tirkîyê çap bû—bû. Gelo çima hewce bû ku çapa we ya nû li dervayî welat bibe û di çapa we ya nû da guhartin hene an na?

B— Rast e, 'Meyro' cara pêşîn li Tirkîyê hat çapkîrî. Lê belê, hema derhal ji hat qedexekirin û hêj ji li wir qedexekirî ye. Jî alîki dîn ve ihtiyaca Kurdên derê welêt ji bî pirtûkên weha heye. Jîbo ku Kurdên derê welêt bîxwinî min derxistina wê pêwîst dît û derketina wê baş ji bû.

Di çapa diduyan a 'Meyro'da tu guhartin çênebûn. Jîxwe di çirokan da nabe ku guhartin çêbibe. Tenê li Tirkîyê min ew wergerandibû tîrki ji û kurdi û wergerana wê ya tîrki bî hev ra derketibûn. Lî Swêd min tenê kurdiya wê da çapkîrî.

PIRS— Bî taybetî li Kurdîstana Bakûr çirok û meselok bî zîmanê kurdi nehatine nîvîsin. Gelo em dîkarin »Meyro« gavek jîbo vê kemasiyê bîbin?

BERSIV— Rast e, li Kurdîstana Jorin çirok û meselok nehatine nîvîsin. Kesên ku destê wan qelem girtiyê ji bala xwe pîrrtir dane ser helbestan û qelesa xwe di wê meydanê da ceribandîne û şixulandîne. Belam bêje, ne îbarete ji helbestan e, ne yekalî ye. Bêje pîrr-

alî ye, bî helbest û piyes çirok û meselokên xwe yeker e. Di pêştaxistî û nûjenkirîna bêje da rola çirok û kurteçirok û meselok û piyesan, bî peyveke dîn rola dûznîvîsan ji jî rola helbesta ne kêmtir e. Jî ber vê yekê, tunebûna çirok û wd. li Kurdîstana Jorin, kêmayîyeke mezin e.

Lî gora vê rewşê, mirov dikare bêje ku 'Meyro', di rîya temambûna vê kêmayîyê û dagirtina vê valayîyê da gavek e. Dema min 'Meyro' nîvîsî ji, yek ji amancên min ew bû ku ez vê gavê bavêjim. Min hêvî dikir, ez nuha ji hêvî dikim ku nîvîskarên dîn ji di vê rê da gava bavêjin, çirok û kurteçirok û meselokna bînvîsîm.

PIRS— Jî kerema xwe hînek li ser xebatên xwe yê nû û pêşî nîvîsîyon dîdî xwendevanên me?

BERSIV— Xebata min a sereke nuha li ser kovara 'Jin' e û ez'ê hêj demeke dirêj li ser'ê bîxebîtim. Ev kovar, salên 1918-1919'an li İstanbul bî kurdi û tîrki derketîye. Lê bî tipên erebî hatiye çapkîrî. Min ew wergerand tipên latîni.

Jî bîl xebata li ser 'Jin' ê, ez li ser ferhenga kurdi ji dîxebîtim. Lê ev xebat nuha gelek gran pêştî dîçe. Ez texmin dikim ku heta sala 1990'i dê temambibe.

Her weha çend pirtûkên kurteçirokan jîbo mezînan, çend roman û rêzîmaneka kurdi ji di bernama min da hene.

Parçeki bernama min ji xebata li ser kovarên kurdi 'Roji Kurd', 'Hetawî Kurd' û 'Kurdîstan'e. Ez dîxwazîm van kovaran ji jî tipên erebî wergerînim tipên latîni.

Yek ji karên ku min dîvê ez li ser bîxebîtim ji, Wergerandîna 'Diwan'a hozanê Kurd ê nemîr Melayê Cîzîrî ye. Ev diwan ji bî tipên erebî ye. Min dîvê ez wê ji wergerînim tipên latîni û ji xwendoxên Kurd ra pêşkêş bîkîm.

Jî nuha ve pirtûkên ku min xîstîne bernama xwe em. Xebata li ser van pirtûkan bî texmîna min 20 sal dîgre.

gazin dikirin, rovî digot : hinekî dîjî xwe bigre. Şêrên weke te çawa ji ber dewêlekê xwe wilo qels nîşan bidin ? û bi van xapan kir ko şêr ji çivaze ket û hew karibû gaz-gazê jî bikî û parsiwên wî bi serhevde hatin guvaştin û serê wî bi ser gewdê wî de hate xwar û got :

Wele rovî te ez kuştim!!.

Lê hê ji nûve rovî destpê kir û got

Ma tu nizanî ev der welatê roviyaye ? wele ezê bikim ko kêzik çavênte bixun !

Rovî ev zirta mezin kir û piştî xwe da Şêrê ser mezin û çû. Lê şêr gazî kir û got :

Hela were xwedêkî tê navê xwe ji minre bibêjî, ko ez di tarîxa jîna xwede binivîsim ?
 Û Şêr bê qeram bûbû. û rovîjî hew jê ditirsiya û jêre got : navê min (Çirto) ye û birêket û çû.

Nizanim çi ças çûbû, mişkek hate binê darê û got : Ha !! padîşahê Hovan ! kê wilo li te kiriye ?
 Şêr dibê xwede got :

Lawo eger karibî alîkariya min bikî ez te ji bîrnakim ! û mişkê reş bi diranên xwe yê n hûrik serê dewêlê kurisand û xiste nav diranên xwe û çend caran li hawîr darê çû û hat û şêrê sermezin bi ser gewdê xwede kumişî û ketê çadê, û mişkê dîvrep li hawîr wî çû û hat û dest bi fortan kir û

Win mirovên mezin rûmeta mênên çê nagirin, ji berê de me xwe dibêrê wede eşandiye lê win nabêjin Aferîn !

Lê Şêr jêre got: xwedêkî navê te çiye ? û mişk got: Navê min (Virto) ye. Hema şêr got: wey limin herambî, ko li welatê Çirto û Virto vegerim û ji wê rojê de şêr çûn.

BEŞDARÎ MEŞA 12--Ê ÎLONÊ BIBE

TIRKIYE JI SWÊDÊ DU KESAN DIXWAZE

Lî gor rojnama "Dagens Nyheter" û ji devê Buroya Nûçeyan, AP, li Ankarayê, Tirkîyê ji Swêdê du kesên siyasi xwestiye. Lê, Wezaretakar û barên derve, yê Swêdê dibêje tu hay û gumana me ji xwestineki weha tune.

Lî gor Dagens Nyheterê, Tirkîyê, ji 15 dewletan 118 multeciyan siyasi xwestiye. Wezîrê dadkariyê, yê Tirkîyê, Cevdet Menteş, di daxuyaniya xwe de dibêje ku ev kes li Tirkîyê xwediyê sîucên granî. Pîraniya van kesan li Almanya' yê dîminin.

Eve cara pêşin ni ne ku Hikûmeta Tirkîyê û berdevkên wê dixwazin xelkê bî van derewan bixapinin. Bî belavkirina van nûçeyan dixwazin ji aliyekê ve çavên kesên şoreşgêr û demokrat bîrtirsînin û ji aliyekî din ve ji, li cem xelkê bîbin xwedi prestîj. Dixwazin xelk wulo zanibe ku destên dewletê dirêj in, digîjin deverên weki Swêdê ji.

Her kes dîzane, ku dewletên Ewrûpa zû-bîzû nîkarin tu kesekî siyasi ku bûbe xwediyê statuya multecîtiyê bî paş ve vegerinin.

MİRÎŞK Û XWEDÊ

Naa ezbenî, ez hewqas ne ehmeqim. Roja qiyametê ê destê min di qirika te da be. Çêtir ew e ku tu ji niha va canê min bistinî. Ew çax ezê jî ji te xelas bibim û tu jî ji min. Ev derd û kulên ku te daye min ne bes bû, inca te qedera min jî xistiye destên Ereban!.. Dê were xwe ne kuje!?

Hasili, ji keran heya kuçikan, hirçan, berazan tim lawêr gazinên xwe pêşkesên Xwedê kirin. Xwedê go da wan û meleka nivîsand. Beriya ku ê civin biqede, ji nişka va bala Xwedê bi mirîşkê ket. Dûman ji serê Xwedê rabû. Xwedê pîrr axiz bû û qirîya.

-Tu li vir çî diki mirîşko!.. Xwedê jê ra got. Ma çî ji te kême? Min tu lawêr wek te delal, xweşik, nazik çênekiriye heya iro. Qismetê te fire ye, mirov xwarin û vexwardin didin te. Ci-

yê te di koxikê da germ e, baş e. Ma tu şerm û fedî naki ji bavê xwe? Carekê din çavê min te nebinin li vir.

Mirîşk ji peyva Xwedê pîrr aciz bû. Perrên xwe vekir, çavên xwe ji Xwedê ra sor kir û got:

-Xwedaho!.. Xwedayê mezin. Ji min kiri ka tu bi her tiştî dizanî. Lê ne rast e. Eger ku tu zaf zane buyayi, Te min ra van qîsên qor nedikir...

Bu teqa -teqa Xwedê û kenîya.

-Ka bêje ji min ra, Xwedê got. Ka çî ji te kême?

-Te got çî ji min kême?

-Erê, çiyê te kême? De bêje ha!..

-Baş e, got mirîşkê, ez ê bêjim: Ya hêka min piçûk bike, ya quna min mezin bike!.. Ez çiriyam lo !.

Dûmahik ji rûpel 5
xwe hatin avêtin. Bî deh hezaran kesên xwedi kargehên navçe an biçûk, esnaf û dikandar ji ber bandêriya û çavnebariya monopolên giregir malwêran bûn û ketin nav refên bêkaran.

Armanca diktatoriyê yek jê ji ew bû, ku mixalefeta gelê Kurdistan û Tirkîyê bitemirine, tevgera şoreşgeri û rızgarixwazi bipelçiqîne û bike, ku carek din nîkaribe rabe ser xwe. Jî ber vê armançê ji cunta bî hatina xwe re, dest bî êrişên dijwaz kir. Dî nabêna sê-çar mehan de ji sed hezar kesi zêdetir pêşverû, şoreşger û demokrat hatin girtin. Bî dehan kes, dî dema êrişên leşkeri yê nî ser gund û bajaran de hatin kuştin. Lî Kurdistanê gund nema ku dî bin zordariya leşkerên cuntayê re derbas ne bû be. Bî rasti bî van êriş û zordariyên ku hê ji dom dikin, armanca cuntayê ne tenê ewe ku hew kesên şoreşger an diji rejîma iroyin bigre bavêje zindanan. Bî vê yekê her wîha cunta dixwaze temamê gel çavtirsandi bike, bîmelisîne û têxe nava bêmeferiyê. Bîde nişandan ka dewlet û ordiya Tirk çiqas bî hêz e.

Heta iro tu kes derneketiye, ku hatibe girtin û bê lêdan û îşkence ji girtigehê an ji bin çavderketibe. Dî bin çav, dadgeh û girtigehan de terorek sistematîk tê ajotin. Dî dadgehan de biryar û fermanên cuntayê, şoreşgeri, welatparêzi tî nî muhakeme kirin. Lî gor, raporên polisên siyasi û li gor ifadên dî bî îşkence, de hatine girtin, şoreşger, kesên demokrat, diji rejîmê diktatoriya faşist tî nî curmkirin. Lê lî hember vê, rê û firsenda girtiyan nine ku karibin xwe biparêzin, lî hember dek û dolabên dadgehên leşkeri derkevî. Jî ber ku muhakemên ku çêdibin ne lî gor qeyd û bendên hîqûqî, lê lî gor siyaseta nîzama diktatori dimeşin, biryarên dadgehan ji ne lî ser himên huqûqî tî nî dayin. Lewra girti nîkarin bî rasti ji alî hîqûqî wan biparize, bigrin. Hela tiştên ku dî girtigeh

û dadgehên Kurdistan û bî taybeti lî yê nî Diyarbekir yê nî kirin, em ne bawerî ku dî dema Elmanya Hitler ji bal Nazîyan ve ji hatibin kirin. Girtigehên Diyarbekir ji kampên Nazîyan xirabtirin. Tadayi, lêdan û talimên leşkeri bî şev û bî roj her ber dewame. Girtigeh ji girtiyan wîlo hatiya dagirtin, ku dî nivinekê de sê-çar kes radizên. Girti tu cari bî xweşiki naneki naxwin. Her tim averuya ber devê leşkeran tim didin wan. Hayên girtigehan ne lî gora jîyana mirovan e. Jî pisi û qarêjê tifo, guniti û werem ketiye nava wan kesên şoreşger, hişyar an ji alî xebatê ve piçeki naskirî berdewam dî hucrên mina tabûtan de diminin. Vatîniyên (wezîfên) ku dane ser milên girtiyan, ji ber kirina marşên ordiya Tirk yê nî şoven û kevnepereşt, gotarên Atatürk û bir û baweriyên Tirkperestiyê ye. Dî çawîşekê de keseki bî tenê ji van tiştan ji ber ne kiribe, lî gor nizamên leşkeri temamê çawîşê didin ber daran. Dî girtigehan de ji bîli vi kari tu kes kîkare ne bîxwine, ne bînivise û ne ji kareki dî nî bike. Pirtukên qanûna, ku ji bo girtiyan pîr pêwîst in ji naxin hundir. Dema girtiyeke ji bo muhakema xwe here dadgehê ne mîmkîne ku karibe perçeki kaxesi nîvisandi yan çelemekê bigre ser xwe.

Girti dî dadgehê de nîkarin bêjin ku îşkence lî wan hatiya an tî kirin. Dema Aîştêki wîlo ji devê wan derkeve dî vegeerê de digrin wan davêjin hucran û carek dî nî dest pê dikin wan dixin bin daran. Dî van her du salan de bes dî girtigeha Diyarbekir de ji ber îşkence û hoyên xerab nêzi 20 kesi mirine. Bî sedan kes seqet bûne an şûra xwe wînda kirine.

Bî muhakemên dî van hoyan de heta iro 21 kes hat idamkirin. Jî 3 hezar kesan re cezayê idamê tî xwestin. Lî tevayî Tirkîyê hejmarî mirovên dî bin îşkencan de hatin kuştin dîghê 4 sedî. U a girîng ewe ku vê terora han çî lî Tirkîyê be û çî ji lî Kurdistanê be

ji lez û beza xwe tu tişt wînda nekirîye. daye xarê, diçe.

Dî warê hindekariyê de dî nav van her du salan de pergalek lî ser esasê ideolojiya faşist hat damezrandin. Jî dibîstana yekem da universitan programên bî esasên nijadperesti dagirti tî nî meşandin. Muxtarîyeta universitan û akademiyan zanîstî hat hilandin. Unîversîte, bî dageriya xwe, imkânên xwe yê nî aborî û bî bernamên xebata xwe ne raste - rast bî kirdayetîya siyasi ve harî nî girêdan. Dî xebata navxwe ya unîversitan de ji idi presibên leşkeri dimeşin.

Lî gor qanûnên piştî cuntayê hatin derxistin, xwediyên monopolan êdî ne tenê dî rîya dewletê re çavdêriya karê hindekariyê dikin, ew bî xwe raste - rast dîkevî nî nav meqamên biryardarên siyaseta hindekariya Tirkîyê.

Jî aliyê dî nî ve, lî gel van kar û barên cuntayê fêkiye siyaseta aborî ya wê ku dî van du salan de hariye meşandin ev e:

Her weki tî zanî nî cuntayê gava dest da ser karî nî beyan kur ku wê dî siyaseta xwe ya aborîyê de rîya biryarên 24 ê çîlê paşî nî bî meşîne. Van biryarana, dî 24 ê meha yekem a sala 1980'yi bî rehberîya IMF ji bal kirdayetîya Demirel ve hatibûn dayin. Lê dî wê demê de dî nav wan hoyên bonana aborî, civaki û siyasi de Demirel rê nî dîtîbû ku biryarî hemîyan pêk bîne. Jî bo pêkaniya biryarî, bandêriyê dîktatori dîvîya. Dema darba generalên faşist bî ser ket, rê lî ber van biryarî vebûn. Dîktatoriya faşist dî van her du salan de ev biryar yek bî yek bî cih anî.

Qimeta perê Tirkîyê lî hember perê dewletên derva hat xîstî. Pêkanîna devalûasyonê ji bin çavdêriya kirdayetiyê hat derxistin. Devaluasyon hat serbestkirin. Destmîza kirêkar û xebatkaran hat cemîdandin. Lî hember vê

buhayê mal bînd bû û zem dî bazarê de serbest bû. Maf dan diravgehan (bankan) ku serbest karibin hîdûdê faizên xwe tespit bikin. Bazirganiya hundir û derva bî tevayî ket bin destên şirketên bazirgan ên gregir. Hemû quncikê jiyîna abori ji sermiyandariya emperyalist re hat vekirin û gelek firsendên mezîn lî ber piyên wan hatin raxistin. Alikariya dewletê ya lî ser kar û barê çandiniyê hat birin, ava van cuhan hat qelabtîn bî ser sermiyandariya sinai de. Barê zekata dewletê bî girani dan ser milên xebatkarên. Dewletê giraniya alikariya xwe da ser monopolan.

Siyaseta cuntayê, monopolên gregir dewlementir kir. Lê lî aliyê din gelek kargeh û şirketên burcuwaziyê navin û hinên gir malwêran bûn. Jî ber xurt bûn û geşbûna sermiyandariya monopolist a Tirkîyê. Jî serê sala 1980'yi vir de 3422 şirket malwêran bûn, çûn. Dî van mehên dawî de gelek banker û bî wan re jî hin diravgehên girêdayî bî wan re temamê sermiyanê xwe bî dest monopolan û bankêr mezîn ve berdan. Hin jî wan reviyên derva, hinan jî intixar kirin.

Van bûyerên han dijîtiya nav burcuwazî û heta ya nav monopolan dijwartir kir. Îdi lî Tirkîyê, cûnta her çiqas bixwaze bî sansor û tedbirên din veşêre jî, şerê navan wan jî bal her kesi ve tê zanin. Dî esasê xwe de, cûnta kardike, ku dijîti û reqabeta nav wan hilîne, lê piştî ku ev yek ne mumkin e, ew jî dî dawiyê de pala xwe dide monopolên gregir.

Bî vê siyaseta han, dî vi du salî de kirdayetiya faşist dî gelek aliyên de xwe bî cih kir. Dest û lepên xwe ghand her quncikên welat.

Lê her çî bî van pêkhatiyên faşizmê xwe bî cih kirîye jî, monopol dîzanin ku raste - rast bî destên fermanandên ordiyê dagerandina rejimê iroyin, jî bo demeki dirêj hin xeteriyên tine. Jî rewşa hindir û çî jî ya navnetewî rê nade ku lî ser navê ordiyê

general dîr û dirêj lî ser kirdayetiye de bîminin. Lew re jî, generalên bî destê komisyonekê makzogonek amade kirin û anîha şandîye meclîsa şêwrê. Piştî çend mehan wê makzagona xwe, dî bin siya qundax û singuyan de bî gel bîdin qebûl kirin.

General dibêjin, ku vê gava em bî birêvexistina makzagonê davejin wê Tirkîye vegere demokrasîyê. Lê yê n ku piçeki haya wan jî makzagona amadekirî heye, baş dîbinin ku makzagona bî rê keve, Tirkîyê venagerine demokrasîyê, rejîma iroyin a faşist meşrû dîke. Generalan dî nav van du salan de, berê bî bîryar û fermanên xwe hemû endamên rejîma faşist sere-rast kirin. Paşiyê jî kiraseki bî navê makzagon lê dîfesilînin. Kiras tucari demokrasîyê nayne

Tirkîyê, lê bê şik wê rejîma faşist bixemline.

Bî kurtebirî rewşa jiyana du salan a dî bin nîrê diktatoriya faşist de ev e.

Wek jî bal xwendevanan jî baş tê zanin, ku sedemê hatina cuntayê ne bes tewşa hundir a Tirkîyê bû. Her wîha mafên emperyalizmê û Natoyê bî xwe jî pêkanîna darbeki leşkerî û sazîrana kirdayatîyek xurt pêwîst dîditin.

Tirkîye, welateki girêdayî bî emperyalizmê ve ye. Endamê Natoya êrişkeu, ango notirvanê emperyalizmê yê Rojhûlata Navin e. Dî sala 1980'yi de gelek guherandin dî Rojhûlata Navin de çêbûbûn. Lî Iran roxandina rejimê Şah û wînda bûna mafên emperyalizma Emerika dî Iran de, şoreşa Afganistan, pêşveçûna şerê gelêrî û dij - emperyalist de Rojhûlata Navin de...û h.w.d. Van hemû bûyerana, rola Tirkîyê lî ber çavê emperyalistan gringtir kiribû. Emperyalizma Emerika bî Tirkîyek nav boranê de nîkarîbû mafên xwe yê n Rojhûlata Navin biparasta.

Lew re jî derba ku bî serket her wîka jî bo mafên emperyalizmê bû. Jî xwe dî van her du sa-

RABIN ŞEHİDNO

Ev nekesna ji we ditirsîn

ji we vedîkşîn şehidno !

Jî hunerên we...

Her yek ji we

Lî ber çavên wan çiyak e

Ciyayên nenasê ketinê

Dî ser şivan de

Dî peymanan de

Dî dirav hejmartinan de

Hun lî ber çavên wan

Wek çiyayên dimeşin ser wan

Ta di xewnên wan de

Hun dibin kabûs

Dest dixin qirikên wan

Ew jî êrişan tinin ser me

Jî ber we

Hov dibin

Çavsor dibin

Har dibin şehidno !

Em kêmhêz ketinî

Rabîn,

Lihêfên ser çavên me direvinin

Jinên me jî paxilên me derdixinin

Lî talanên me dixinin

Rabîn, bîbinin,

Rabîn şehidno !

Em tola xwe hilînin.

FIRAT CEWERÎ

lan de buyerên lî Rojhûlata Navin pêk tên vê yekê baş nişan dide. Ger iro lî Tirkîyê piştî Emerika xurt nebiya, Israil êrişên xwe yê n mezîn ên lî hember Filistinî û şoreşgerên din nîkarîbû bîdomanda. Piştî cunta yê girêbendiya Tirkîyê bî E.E.Y û bîNato re kurtir bû. Niha Tirkîye, balafirgehên xwe firehtir dîke, jî bo ku balafirên Emerika yê n sixurî û yê n şer karibin hêsatir lê deynin. Tirkîyê re daye Emerika ku hêzên xwe yê n leşkerî, bî navê "Hêzên Lez" lî Tirkîyê bî cih bîke û h.w.d.

Beşdari Meşa 12-ê îlonê Bibe!

Cih: Sergeştorg
Saet: 13.00

Ji Hemû Hêzên Demokrat Re

Dî 12 ê îlona 1980-yi de, cûnta faşist a leşkerî, li Tirkîyê, dest dani ser iktidarê. Li gor generalan, armancên cûntayê »rawestandina terorizmê» û »cudakeriyê», û »ji nû ve avakirina demokrasîyê» bûn. Lê di şûna van de, cûntayê, parlamentoyê belav kir û hemû xebatên demokratîk qedexa kir. Endamên partiyên siyasî û rêxistinên demokratîk girt. Sendika pêşverû, DÎSKê, qedexa kir û endamên wê avêt girtigehan. Mahkemên leşkerî, ji 52 serokên DÎSKê re cezayê idamê xwestin. Bi sed hezaran kes di îşkencên hov û nedîtî de buhurin. Bi sedan kes jî, di bin van îşkencan de mirin.

Cûnta, li Kurdistanê bi dû welatparêz û pêşverûyan ket, navê »xayintî û cudakeriyê» bi dû wan xist û bi sedan jî wan li nav rastê qetl kir. Peywendiyên Gelê Kurd, di bin îşkencên fizîkî û psikolojîk de, ji dinya derve birand.

Heta niha cûntayê 13 kesan bi dar de kirîye. Û heta niha bi hezaran kes bi cezayê idamê hatine mahkeme kirin. Ji kesên ku karibûne derveyî welat jî, bi sedan jî mafê xwe yê hemwelatîyê bûne.

Dî ser cûntayê re du sal derbas bûne. Hîn jî bi sed hezaran kes girti ne û jî mafê xwe parastinê — bi wesita parêzer— û ditîna mirovên xwe bê par in. Ev kesana, di bin hoyên nemirovî û îşkencê de dijîn. Gelek jî wan, bê ku tu şopeki li dû xwe bi-hêlin wînda bûne.

Cûntayê, bi sozê »vegerandina bi bal demokrasîyê ve» eftarê umûmî xapand. Dî dewsa vê de, dixwaze bi zagona bingehîn a nû, faşîzmê bide rûniştandin.

Zagona bingehîn, hemû mafên demokratîk û azadiya weşanê qedexa dike û iktidarê giş dixê destê serokomar. Zagona bingehîn, bi direktîfa cûntayê amade bûye û wê jî aliyê meclîsa şêwrê ve jî, bi vi rengî bête qebûl kirin. »Vegerandina bi bal demokrasîyê ve» derew e. Û faşîzm wê di idara svîl de jî dom bike. Ji xwe zagona bingehîn rê nade avakirina partiyên siyasî.

- Bimre cûnta faşist a leşkerî ya Tirkîyê!
- Piştgiriya girtiyên siyasî bike!
- Piştgiriya hêzên demokrat ên gelên Kurd û Tirk bike

FEDERASYONA KOMELÊN KURDISTANÊ LI SWÊDÊ
KOMÎTA TIRKÎYE

JOEJER:

- 1- Kulilkek (b1 tırki papatyay). - Kole, bende, ê sir.
- 2- L1 ser wê nan tê lê xıstın, b1 taybeti ji nanê şkeva. - Noteyek.
- 3- Eş, tajan, nexweşi. - Dengek.
- 4- Av anji tişteki ne zelal (Berepaş). - Peyvika lı hember "NA" yê.
- 5- B1 sorani dıbêjin "Cejn", B1 Dımılı jêre dıbêjin "Roşan". - Bûyerek xuzayê (tebiat).
- 6- Yê lı hember Dehaqê zılımkar rabû û ew kuşt. - B1 zaravayê Dımılı "can".
- 7- Noteyek. - L1 hinek ciya dı şûne "Hiç" te tê b1 karandin.
- 8- Dı dirokê de dewletek Kurda.
- 9- L1 hinek heremên Kurdistanê jêre "Arvan" an ji "Ard" tê gotın û disa lı hinek hereman ji dı şûna agirde tê b1 karandin, herweki lı qerejdaxê. - B1 Latini Fıkr, Raman, Birû baweri (Berepaş).
- 10- Tişteki ne tûj, herweki xençer, kêr an şûrê ne tûj. - J1 tevlıheva mastû avê pêk tê.
- 11- L1 gunda berê ji bo kû pez an ji dewarên wan wende nebe, dereki wan îşaret dıkrın an ji b1 tişteki dışewıtandın, ji wê bûyera şewıtan dınê re tê gotın. - Xweli, toz.
- 12- Pronavê keseminê sısêyan yê yekejımar. - Beg.

RASTE CEP:

- 1- Berê dı şûne Hekim an Dıxtor de dıhat gotın. - Wehşi, no, har, şek.
- 2- Beyraq, a'lem. - Noteyek (Berepaş). - Cemê mezin.
- 3- L1 hinek ciya dı şûna tûj de ji tê b1 karandin. - B1 zaravayê Dımılı av (Berepaş). - Roja bori, ne iroj.

X A Ç E R Ê Z

	1	2	3	4	5	6	7	8	9	10	11	12
1												
2												
3												
4												
5												
6												
7												
8												
9												
10												

- 4- B1 Erebi de pırejımar a "Sii" ya. - Dı islamiyetê û dı olên dınê de mirovê pêşın. - (Berepaş).
- 5- Weha, wani, wılo, wa, wısa, wakino. - Ne serbest, b1 Erebi dıbêjin "memnû".
- 6- B1 zaravayê Dımılı "NA". - Dı Televizyonê de pêşveçûnek nû. - (Berepaş).
- 7- L1 başûrê Iranê heremek, tê gotın ku xelkê wê derê Kurdın.
- 8- Sebır, qeri û herweha naveke.
- 9- Ne do û ne sibê. - L1 hinek heremên Kurdistanê ji xaniya re tê gotın, lı hinek ciyan ji j1 ser xaniyan re tê gotın. - Mû yê rû.
- 10- Dı germê de pêk tê, serab. - L1 hinek ciyan jêre "hevrişm" ji tê gotın.

AGIRÎ

O. Sebri


Ho çiyayê pırr qenc û rınd!
 Bi cih û warên xwe,
 Şax û kûntarên xwe,
 Ji roja Cîhan ava bû,
 Şopa Adem di nav xuya bû,
 Di rojhilata navîn,
 Wî erdê delal û şırîn,
 Her tu yî gewre,
 Her tu yî bilind.

Herwekî hatiye gotın,
 Di Tewratû Ouran,
 Ji her alî Cîhanê rabû,
 Lehiyek bê teşe giran.
 Piştî ku Nûh nifir kir,
 Yezdan lehiyek mezin rakir,
 Keştiya Nûh serav bû,
 Reşayî tev binav bû,
 Bê dagirtiyên keştiyê,

Hemî dehbe û mirov,
 Çi kedî çi hov,
 Neman tinawir,
 Firrende û cinawir,
 Li ser rûyê zemîn,
 Neman xwedî jîn,
 Dîsa wê hîngê,
 Çiyayê çak û rınd,
 Navçava te ya bilind,
 Ji bo zindıyan,
 War û girav bû...

Dawî,
 Li navçava te venişt û rawestî,
 Keştiya çeleng,
 Nûh bi lavayî dawestî,
 Bê awaz û deng.
 Laveya pêşın ji bo te dikir,
 Dixwest ji Yezdan,
 Ku rûmeta te bilintir bike,
 Di nava çıyan.
 Ji wê hîngê va sersiyê dıkin,

Li ser te hin ewr,
 Serê te yê berz hat xemilandın,
 Bi taceke gewr.
 Ji wê rojê da tu xoşewîstî,
 Li nik me Kurdan,
 Hîngê tu bû qblegah ji bo mirov,
 Di nava Cîhan.
 Zerdest ji axa te çar bû,
 Bû pêxember,
 Yekîtiya Huma wî da zanîn,
 Ji bona beşer.
 Swrekî dirêj ew rawestî,
 Di şikêr û besta,
 Bi ramana xwe, wî xwedê nasî,
 Berî Awesta.
 Ji mirovan ra dida zanîn,
 Wî qenc û kirê t,
 Guneh û tarî vedikuştın,
 Bi agir û pê t.
 Ji pêşiyê me ra wî salixda,
 Ew rê ya ronak,
 Bawerî, qencî, rûmet,
 Bi wê ola çak.



Ma Mo Ste

WWW

12. İLON. 1980

12. İLON. 1982



Du Sal Dı Bın Diktatoriya Mêtıngıhkar û Faşist De